kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 53 | bihar | 2012



Dadgeha pêşewa Qazî Mihemmed

Li gundê xwe laz, li Konyayê kurdê bi boç

Şêxbizingel kî ye, ji ku kêçax raçe hatiyîne Heymene?

Şopên dema xatirxwaztinekê

Destûr

Temenê têkçûyî

www.kurdi.org



Nuh Ateş, vê carê jî mistek kurteçîrokên gundê xwe di "Tayek por" de hûnandiye û bi kitêbeke şîrîn derdikeve pêş xwendevanên xwe. Nuh Ateş di pêşgotina xwe de dide diyar kirin ku wî nexwestiye yekcar dev ji zaravayê herîmî berde. Loma jî cî bi cî meriv di kitêbê de rastî gotin û vegotinên kurdiyeke qedîm û resen tên ku li gelek deverên din hatine ji bîr kirin. Em dikanin bibêjin: yek ji wan hêjayiyên kitêbê jî ev e.

"Ez bi zaravayê gundê xwe mezin bûm û hatim şîretkirin. Lowma tesîra wî zaravayî li ser kurteçîrokên min, hin caran zêde û hin caran kêm heye û va jî tiştekî xwezayî ye. Her çiqas hewldan û pêşketîyên bi qedr di vî warî da hebin jî, meriv nikane îro qala kurdîyeke standard û seranser bike. Ji bo kurdîyeke standard perwerdeya bi kurdî hewce ye. Mixabin hîn em negihêştinê vê qonaxê. Ji ber vê, ez nivisandina nêzikî yan di bin bandora zaravayên herêmî da diparêzim û hewce dibînim."

Ji pêşgotina nivîskar

www.arsiv24.com



Li gundê xwe laz, li Konyayê kurdê bi boç

Mem Xelikan



Dadgeha pêşewa Qazî Mihemmed

A. Qasimlo



Şêxbizingel kî ye, ji ku kêçax raçe hatiyîne Heymene?

Xamgelî Bane



Çanakkale, Yemen, Balkan ve Rus savaşlarında şehit düşen, Orta Anadolu Aksaray - Ekecik'li Kürtlerin yaşam hikayeleri

Ömer Yüce

www.arsivakurd.org

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB
hejmar 53 | bihar | 2012

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Ciftci SeyfiDoğan Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran,
Mem Xelîkan, Mustafa Mıh, Özgür Kara, Ecevit Yıldırım, Faik Balcı
û Yusuf Polat

Adress: Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post: info@birnebun.com
Internet: www.birnebun.com

Têkilî/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım
Ewrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı: Europa: 5Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı: Apec-Tryck AB



Jinên Şêxbizinî ji Heymaneyê

Wêneya li bergê: dîmenek ji bihara Xelika Jor, li hewşoyê Hecê
(ji arşîva Seyfi Doğan)
Xalîça li pişt bergê: ji gundê Mihîna, sal 1870
(ji arşîva Nesrîn Bayramê)

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

Naverok/İçindekiler

6
Ji Bîrnebûnê
Alî Çiftçî

10
Li gundê xwe laz, li Konyayê kurdê bi boç
Mem Xelikan

17
Dadgeha pêşewa Qazî Mihemmed
A. Qasimlo

23
Heyran û qurban
Gurdo

24
Du helbest ji Seyfi Doğan

26
Çîyayên asê
Îbrahîm Korkmaz

28
Şopên dema xatirxwaztinekê -II-
Nuh Ateş

35
Destûr
Seyfi Doğan

40
Temenê têkçûyî
Xizan Şîlan

41
Şêxbizingel kî ye,
ji ku kêçax raçe hatiyîne Heymene
Xamgelî Bane

45
Rola medyayê li ser zimên -1- "fergenga me ya dîtbarî"
Îhsan Turkmen

53
Çanakkale, Yemen, Balkan ve Rus savaşlarında
şehit düşen, Orta Anadolu Aksaray - Ekecik'li
Kürtlerin yaşam hikayeleri.
Ömer Yüce

www.arsivkurdi.org

Ji bîrnebûnê

Bi hejmara biharê re em disan bi hev re ne, xwendevanên bi rûmet!

Bihareka bi xêr û bereket bo me giştikan pîroz be!

Ev hejmara biharê, divê di meha adarê de derketa, mixabin ji ber hinek kêmasiyan ev hejmar bi du mehan bi derengî ket! Em hêvî dikin, xwendevan û aboneyên kovarê dê me bibexşînin!

Kovarên demsalî, dema di wexta xwe de dernekevin, bi rastî ji aktualîteya demsalê dûr dikevin! Eger ev kovar di Newrozê de biketa destê we me dê di armanca weşangeriya xwe de, xwe serwext bidîta!

Lê em ê sozê nedin ku em ê ji vira ha her di wextê xwe de, kovarê bigîhînin ber destê we, lê em ê wek hevkar, nivîskar û hezkirên Bîrnebûnê, bi hev re, qeyret bikin ku ji vira ha di wexta xwe de kovarê bigîhînin we!

Kovar bi serê xwe bi qeyreta çend kesan an jî bi komekê nikare jiyana weşangeriya xwe bi rêk û pêk bidomîne! Jê ra hevkar, piştgir, xwestek, hewceyî û xwendevan lazim in!

Ji bo ku ev kovar bikaribe jiyana xwe ya weşangeriyê bidomîne jê re piştgiriyeka xurt û aboneyên zêdetir lazim in. Ne tene bi gotin, bi qeyret xebat lazim e!

Hewcedariya kovareka wiha her heye û her ku diçe jî em hewcedariyên pir mezin dibînin bo kovarên wek Bîrnebûnê!

Ji ber xelkê me û kurdên ji Anatoliyê ji her aliyê kesayetiya xwe de bêpar hatiye hiştin! Jê re tu îmkan, ji derveyî xwe înkariyê, nehatiye dayîn! Heta niha jî tenê mafekî wan heye ku xwe wek tirkekî bibînin û bêjin: "*em "birayên hev ên misilman in. Ti ferqa me û tirka ji hev tuneye!*"

Bi salan, bi taybetî jî di van salên dawî de, ev polîtîkaya wek mîrasa dewleta Osmanî, li tevayiyê welêt berdewam e. Tesîreka xwe ya pir xurt û giran li ser kurdên me yên Anatoliyê kiriye. Ji niha de em rastî gotinên wek "*em* û *ew*" tên. Ev jî dikane rê bide wê yekê ku xwe ji kurdên din cudatir bibîne û xwe hê nêzîkî tirkan bibînin.

Mixabin, piraniyên hevkarên

www.arsivakurdi.org


kovarê ku li derveyê welêt, yan li metropolên Tirkiyê û yan jî li welatên Europa dimînin. Her çiqas dil û hişên me li ser welêt be jî, em pir jê dûr ketine! Civata me di pir aliyan de tehribat dîtiye!... Loma, niha ji berê hê bêtir ji bo ku nasname û kesayetiya ciwanên me bê nasîn û parastin xebatên bi organîzekirî yên berbiçav lazim in!

Divê em hem ji xwe re û hem jî li hember we xwendevanên bi rûmet rastiya hinek tiştan bibînin û bibêjin! Dema em a dilê xwe û gotinên xwe ji hev re vekirî nebêjin, em ê nikaribin pêşiya xwe bibînin û bi pêş kevin!

Lazim e, ev kesên ku dinivîsînin di wexta xwe de nivîsên xwe bi rêk û pêk bişînin. Kesên abone divê bi berpirsiyariya abonetiya xwe bizanibin! Dema edresa we hat guhartin ji kerema xwe me agahdar bikin.

Bi hêviya xebatên serkeftî bimînin di xêr û xweşêyê de heta hejmara bê!

Alî Çiftçî



Ji ber guhartina adresan kovarên ku paşde wegeriyane.

www.arsivakurdi.org

BAJARVANİYA BÜLENT ARİNÇ

Nuh Ateş

"… Kürtçe anadilde eğitimin önünde anayasal engel var. İkincisi, anayasal bir engel olmasa, Kürtçe bir eğitimin kaliteli bir eğitim olabileceğine inanıyor musunuz? Bir medeniyet dili midir Kürtçe? Böyle anadilde eğitimi düşünmüyoruz. Anadilde eğitimin Türkçe olması hem beraberlik sağlıyor hem de Türkçe bir medeniyet dilidir. Türkçe'yle eğitimin her alanına hizmet edebilir."

Di bernameyeke TV de cîgirê serwezirê Tirkîyeyê, Bülent Arinç wer gotiye. Ji gotinên Bülent Arinç der tê ku kurdi ne zimanê bajarvanîyê (şaristaniyê) ye û lewma ne rewa ye, ku ew di perwerdeyê da bê bikaranîn.

Pir caran, gilîgotinên ku ji devê merivekî sîyasetmedar û xudanmeqam dertên dibin nîşana paşperdeya helvesta wî ya sîyasî û ideologî.

Ji gotinên Arinç çendek wate tên der:

Wateyek ew e ku du çeşîd ziman hene; zimanê bajarvan û zimanê hov (wehş, barbar) û tirkî zimanê bajarvaniyê ye û rewayî bikaranîna di perwerdeyê da ye û kurdî zimanekî hov e û ne rewayî bikaraniya di perwerdeyê da ye. Meriv dikane li gora vê nezarê, miletan jî ji hev cihê, wekî yên bajarvan û yên hov salix bide: Tirk, ji ber ku xwediyê zimanekî bajarvanîyê ye, bajarvan in û kurd, ji ber ku xwediyê zimanekî hov in, ango miletekî hov e. Dagirkerên Ewropî jî milet wer ji hev cihê didan nasandin; miletên xwe wekî bajarvan û yên ne Ewropayî jî wekî miletên hov û rewayî bêqimetkirin û qirkirinan salix didan. Ev ideologiya li ba Împeretoriya Osmanî jî hebû û di serîyê piranîya elîtên sîyasî û rewşenbîriya Tirkîye da jî heye. Lewma Arinç û yên ku wekî wî difikirin, ji xwe ra heq dibînin ku derheqa salixdana zimanê kurdi û perwerdeya bi wî da fetwa û ferman bidin û bi rêya qedexeya makqanunê pêşîyê li ber geşbûna

www.arsivakurdi.org

kurdî bi rêya perwerdeyê bigrin. Ma va ne helvest û aqilê destdirêjiyê ye û binpêkirina mafên xelkê kurd e? Binavkirin yan salixdana kurdî û bikaraniya wî di perwerdeyê da mafê kurdan bixwe ye ne yê kesekî din e.

Ji gotina Arinç meneyeke din jî tê der. Kurd û kesên din yên ku mafê perwerdeya bi kurdî dixwazin, bi vê helvesta xwe, di eslê xwe da li dijî bajarvaniyê derdikevin, bi gotineke din, ketine pey hovîtiyê.

Tê xwastin ku zimanê kurdî bi rêya zora qedexeya makqanunî wekî zimanekî „hov“ bimîne û xwediyên wî yên kurd jî bi zora asimilasyonê bibin tirkên bajarvan. Ma kê kaniye ku bi zorê, bi qirkirin û bendkirinê xelkên din bike bajarvan? Yan kîjan milet ê bibê zimanê min zimanekî „hov“ e, ez ê ji perwerdeya bi wî fereqet bikim û zimanekî bajarvanî ji xwe ra helbijêrim?

Bi rastî, ne milet ne j zimanê bajarvan û hov hene. Kultur û civatên bi nav û nîşanên xwe yên xas û ji aliyê qonaxên pêşvaçûyîn û geşbûna sosyalî, teknikî û ilmî da ji hev cihê hene. Her bajarvaniyek yan kulturek di nava xwe da pircûre ye, rûyên xwe yê tarî û „hov“ jî hene…

Welhesil, bingeha gotinên Arinç ên li ser bajarvanî û hovîtiya zimên bîrûbawerîya kultura dagirkerîyê ye.

12.02.2012

Bang

Encumena bala ya zerdeştîyên Kurdistanê bi merasîm peresthgeha xwe ya li Stockholmê vedike.

Encumena bala ya zerdeştîyên Kurdistanê bi merasîm peresthgeha xwe li Stockholmê bo raya giştî vedike. Piştî qedexebûna 1000 salan zerdeştîyên kurd cara pêşîn li cîhanê peresthgeha xwe ya yekemîn bi merasîm vedike.

Em li vir bi kefxweşî bangî we dikin û beşdarbûna we ya di merasîmê de dê me dilşad bike. Werin em bi hev ra vê kêfxweşîyê û vê rûmetê par ve bikin!

Encumena bala ya zerdeştîyên Kurdistanê

Bi xêr bên!

Cîh: Turebergs allé 4 - Sollentuna
Dem: 9 heziran 2012 roja şemiyê
Seet: 14:00-16:00

www.arsivakurdi.org

Li gundê xwe laz, li Konyayê kurdê bi boç

(Sohbetek bi Fatin Kanat re)

Mem Xelikan

Fatin Kanat, xwenda û weletperwerekî ji kurdên Anatoliyê ye. Li sala 1958an, li Konya-Cihanbeyli gundê bi navê gundê Buldiq ji dayik bûye. Dû xwendina xwe ya yekemîn û xilaskirina Lîsê ve dest bi xwendina zanîngehê kiriye. Wek her xortekî wan salana (1970-80)tev li xebata Ciwanên Demoqratîk û Çandî bûye. Dû ve jî ji aliyê cuntaya faşîst ya 12ê îlonê ve hatiye binçavkirin û hepskirin. Ji zilm û zora wan rojên reş, wek herkesekî para xwe girtiye. Huro jî li Ankarayê bi serê xwe kar dike. Min xwest ew hekata jîyana xwe, bi xwendevanên Bîrnebûnê re parveke. Ji bo wê yekê mala wî ava be, pêşnîyara min qebûl kir û ez li xurîniyekê kirim mêvan. Û pirsên min ên li jêr, ji bo we bersîvand.

Birêz Fatin, ez dixwazim we hinekî ji nêz de nas bikim. Tu dikarî xwe bo xwendewanên me bidî naskirin. Ka Fatin Kanat kî ye? Li ku hatiye dinê? Zaroktiya te li kuderê derbas bûye?

– Ez sala 1958an li gundê Buldiq, girêdayîyê qeza Cihanbeyli-Konyayê hatime dinê. Alîyê bavê min kurd, alîye dayîkê ji Behra Reş in. Ya tu bizanî ez li derekê hatim dinê ku li wir li malê bi tirkî, li sûkê jî bi kurdî dihate axaftin. Ez herdu zimanan bi hev re êvisîm. Min nedizanî herdu ziman wek hekata ku dibêjin du tişt têkevin bawilekî ew ê dûre li dijî min derkevin.

Ya ku navê min Fatin e, ne tesedufek e. Apê min î mezin Ahmet Fevzi Yılmaz, parêzer wû. Hevalê Fatin Rüştü Zorlu yî cane can wû. Apê min siftê navê lawê xwe dûwa jî navê min Fatin pêvakiri bû. Fatin Rüştü Zorlu ji kurdan wezîrê yekemînî T.C. yê karê derve wû. Tu yê bêjî ku çi taybetîya wê heye. Lê DPya ku wek AKPya huro, bi waadên demoqrasî, bêhuqûkîya dema yekpartîyê hesaba pirs kin, hatî îqdidarê sozên dayine gel ji bîr kirin. Îqdidar bi dest xwe xistin nexistin, dest bi binçavkirin û girtina muhalîf û kurdan kirin. Ev yeka bi Fatin Rüştü ve girêdayîyeke girîng heye. Menderes û aqildarên wî, ji bo ku şîyarbûyîna kurdan ya netewî dawestînin û xirab bikin, bi fikirên xwe wê çareser kin, 500 ronakbîr, merivên pêşverûyên olî, reîs û axayên serokeşîrên kurd binçav kirin. Ew, di qampa Sêwasê de heps kirin. Bi wan aqilên xwe yên biçûk, dixwes-

www.arsivakurdi.org



tin wana qetil bikin û ji pirsgirêka kurdan xilas bin. Fatin Rüştü li hember wê biryarê derket. Ew bîryara, hetanî pirsgirêkê çareser bike, ya her çû di zorê ke û xirab bike anî ziman. Bi ser ehtiraza wî de, îdam dawestandin. Hejmara wan girtîyan bi ser wê de ji 500î dakete 50yî.

Cuntaya 27ê gulanê, ya ku îqtidara DPê serejêr kirî ew doza, bi 50 girtîyî kurd dewr heyna. Efuya sîyasî ku di dû doza DPya ku bi 3 îdama encam girtî (Wek tê zanîn, Fatin Rüştü Zorlu jî di nav de wû) kurdan fêde nedît. Ew ji efuyê li der hiştibûn. Ji wan 50 girtî, ronakbîr û xwendayên kurdan yek, di girtîgehê de rehmetî bû. Dû ve ew doza bi navê doza 49an derbasî dîrokê bû. Waya hekata navê min e. Kurd li Anatoliyê bi xwe hindikayî wûn. Ji bo ku dayîka min ji Behra Reş e, em ji xwe dervayî kirin.

Bi mînakekê, wê dikarî jihevkî?

– Bi gotina:"Laz, bir teneke kaz" zarokan em xullî û aciz dikirinî. Ji dayîka min re xerawi dikirin. Em ji xwe nedîdîtin û em ji xwe dûr dixistin. Em pênc bira wûn. Di wê navberê de me alîyê dayîka xwe hê girîng girt. Ezî heyşt salî wûm, me koç kir Konyayê. Li wê derê axza dayîka me nehat dîtinê. Lê li wira jî em bûn kurdên bi boç. Vêstê, tiştekî girîng hate bîra min. Dixwaze ez wê jî bînim ziman. Dema li gund di sinifa dudiyan de wûm, mamoste bi şagirtan re bi wasita min têkilî çêdikir. Teleban jî bi mamoste re bi wasita min diaxifîn. Mamosteyê me yî li destpêkê dilgerm, rojekê ji nişka ve hate guherînê. Bi dengekî bilind û hişk got: *Ji huro şuva, hûn ê li tu dera qet bi kurdî neaxifine.* Bi wê jî nebû, ji bo yên li nav gund bi kurdî deng dikin tesbîtkim wî ez wezîfedar kirim. Ya hûn bizanin, wî ez wek ajanekî bi kar anîm.

Erê, vaya li her gundekî kurdan kirin. Ji bo wê wezîfê, wan ez jî li gundê me dam xebitandin.

– Min çend salan şuva êwisî, ev talîmateke MEB ya navendî ye. Ew wezîfa ku mamoste dayî min, min li ser meriyekî xwe yî bi salan ji min mez-

www.arsivakurdi.org

intir û tenakê jî zilm li ser me dikirî, li ser Îsmet tetbîq kir. Dora dine royê, em çûne dibistanê min ji mamoste re got: Îsmet, li ber mizgeftê bi kurdî deng kir. Min nedizanî bi ser wê de mamosteyê bi hemdî xwe Îsmet biêngêve. Vaya cezayê dengkirina bi kurdî wû. Û ez jî bûwûm sebeb. Em ji dersê derketin, min dizanî Îsmetê der rêya min bipê û min xweş kotek ke. Ez çûm cem Îsmet. Wek min dizanî min, koteka xwe xwar û ez çûm mal. Dora dine ro ye, min ji mamoste re zarokên ku ji kurdîyê bêtir bi tu zimanan nizanin çima têne cezakirin? Ew bêaqilî ye, bi qasî ku zimanê min li çerx bûyî, min jê re got. Û min got: ez, carek din vê wezîfê nakim.

Li ser gotina te reaksîyona mamoste çawa bû?

– Na, tu reaksîyon neda. Careke din jî ew mesela neanî rojevê. Dibe ku çûbû ferqa xeletîya kirina xwe. Ji sinifa duduyan şuva me koç kir Konyayê. Min dibistana navîn û lîse li Konyayê xwend. Cara pêşîn Konyayîyên ku ji me dûr dadiwestîn û em nêzî xwe nedikirin, demekê şuva ji me hez kirin û em ji xwe dîtin.

Ew guherîna li wan bi kîjan sebebê pêk hat?

– Di wê guherîna wan de para ku dayîka min ji Behra Reş wû pir bû. Ahenga me, mêvanperwerîya me û yek jî cîraneke me ya Giritî di wê guherînê de rolê xwe pir pir bû. Em ji nêzik de nas kirin. Ji me hezkirin. Têkilîyên malbata me ya bi wan re jî baş wûn.

Em werin xortanîya te, te li kîjan bajarî û li kîjan zanîngehê xwend?

– Min lîse xilas kir dûwa min *Ankara Yüksek Teknik Okulu* qezenc kir. Min nedixwast ez ji Konyayê veqetim. Ez li wira di qulubeke fotbolê ya pofesyonel de lîstikvan wûm. Ji bo wê, bi bavê min ve navbera me qetîya. Herdê, xwendin dawestîya yî, di dû goga lingan meşîyan li wî bi qar dihat. Bi ser wê de ez hatim Ankarayê. Çûm dibistanê, min dît dibistan di bin îşqala faşistên MHPê de ye. Min fehm kir ku tev li wan nebûm tu rehetîyê nadine min û ez li wir bi rehetî naxwînim. Li Cebecîyê li cem dapîra xwe dimam. Min êwisî, li wê taxê havalên di halê min û rewşa min de zêde ne û faalîyetên wana yên çandî û demoqratîk hene. Ez bi wan re ketim têkilîyê. Dûwa pêvajoyeke polîtîzasyonê yê bi lez dest pê kir. Min êwisî ku di jîyanê de tiştên ji fotbolê hê girîngtir hene. 3-5 mehan şuva ez bûbûm xortekî bi navê *Dev-Genç* ku afîşa bi dardadike û belevokan belev dike.

www.arsivakurdi.org

Ma gelo bi dîtinên te jîyana xortanîyê hebû an na?

– Ew, bi dîtina meriya ve girêdayî ye. Girêdayîyê terza jîyana te ye. Di xortanîya xwe de, ez demekê listikvanekî fotbolê wûm. Dûva, wek min li jor jî behs kir ketim nav jîyanek polîtik. Qet tu caran li paş xwe venegerîyam û tu pirsên ku "em çi dikine?" min ji xwe nepirsî. Li wan salên xortanîyê, me ji ruh û can ew berpirsîyarîya dabû ser milên xwe û bi qîmet jîyaneke parelel jîyam.

Ji ber çi tu hatî girtin? Tu dikarî ji min re behsa jîyana xwe ya girtigehê bikî?

– Ez, bi navê doza KAWA hatim girtin. Ez, berê di nav hevalên DEV–YOLê de wûm. Fikirên van hevalan, ji bo mijara netewî û çareserkirina wê, têrî min nedikirin. Bi ser wê de, ez ji wana veqetîyam. Tew li hevalên rêza KAWA bûm. Ji bo wê dozê jî hatim girtin. Li Sibata 1981an ketim hundir. Min ji madde ya T.C.K. 125an cezayê hepsa muebbet girt. 15 salan di hundir de mam. Li wan rojên reş, li darizandinê (yargılama) û rojên dûva, min û hevalên min jî me wek herkesekî ji îşkencê, ji cezayê hucrê û ji zilm û zora girtigehê para xwe girt. Me dizanî rejîma Turkiyê ya bêhuquq û bêmaf, zilm û zora wan ya kolonyalîst li ser kurdan ji berê de xwedîyê praktîkekê ye. Em li hemberî wê derketin. Em li dijî wê dawestîyan, me hesab kiriwû ku bedeleke xwe ya girtin, îşkence, mirin… hwd ê hewe. Ji bo wê jî her tiştekî ku em pê jîyayîn, em şaş nekirin. Bi şiklekê tiştê ku me dizanî û me dipayî wû. Di wê rewşê de li dijî wê rejîma zordest û zilimkar me hêvî zindî hişt û em di nav xebat û berxwedaneke bi rûmet û serbilind de wûnî.

Tu dikarî bîranîneke xwe ya wan rojana bi me re parvakî?

– Bîranînên wan rojan, pir zêde ne. Nizanim kîjanê bêjim. Em, li hepsa Alemdaxê ya leşkerîyê wûnî. Li hemberî me çekên kimyevî bi kar anîn. Li wan rojan, girtîyên dû emîyetê û dadstanîyê (savcılık) ve hatin girtigehê, ji kêfa re car caran dibirin emnîyetê û îşkence dikirin. Li berxwedaneke dijî wê kirinê, bi fermana *İst. Sıkı Yön. Komutanligi*yê, bi çekên kimyevî em bombe kirin. Camên qoxişan şikandin û ew bombeyên gazê yên amerîkî avitin hundir. Li ser wan bi îngilizî *"Li hember girtî yên şer, li derên girtî bi kar nînin û li meydanên ji hev pir bi baldar bi kar bînin."* nîvisandi bû. 45 bombe ji wana avitin 3 qoxişên ku nêzikê 300 meri tê de. Wê rojê li Stenbolê bayê lodos hebû. Lodos derbasî pêşîya komkuştineke cunta faşîst bû. Di wê bûyerê de

www.arsivakurdi.org

Şerif Yazar, Hakan Mermeroluk û mamosteyê teqewut Bahadır Dumanlı şehîd ketin. Em giştik, em wiqasî nexweş ketin ku wan em rakirin nexweşxaneyan. Lê bîrindarên giran tenê birin nexweşxaneyan. Li wê operesyonê ew rêvebirên girtigehê yên bêdaxwaz li dervayî bîryarê hiştibûn. Ew operesyona bi tîmên taybetî pêk anîbûn. Li encamê pir heval ji pişikê de nexweş ketin, pir heval jî seqet man. Hevalên ku cixare nedikişandin hê zêde di bin tesîra bomban de man. Hersê hevalên şehîd bûn, hersêyan jî cixare nedikişandin.

Pîştî tu ji girtîgehê derketî, hêvîyên te yên li jîyana derveyî girtîgehê çi bûn?

– Di hundir de, ji derva pirtir min dixwend û bi rêya nameyan bi merivên welatên dinê yên din ve têkiliya min hebû. Ez li welatekî çawa û li dineke çawa dijî me, dema di hundir de bûm jî min dizanî. Di girtîgehê de, 24 saetan têrî me nedikir. Di heftekî de me 50 name (Bi Tirkî, Fransî û İngilizî) dinivîsand. Ji xeyrî rojnameyên rojane, me kovarên sîyasî yên wê wextê dihatin weşandin, giştik dixwendin.

We her rojname û kovar bi rehetî bi dest dixist?

– Yên girtîgehê nedidane me, bi rêyên din me bi dest dixistin. Nêzikê rojên bi derkevim, pêvajo wisa bû. Bi vê maneyê, li derketinê di serê min de pir pirs tunewûn. Jîyaneke ez texmîn dikim, dê dest pê bikime. Dema ez ketim hundir bi navê min malbata min ji cîran û hevalan dervayî kiribûn. Dema derketim der, xebat û berxedana kurdan ya netewî û demoqratîk pir rê heynayî wû. Ji bo wê, derketim şuva ji ber zîyaretên cîran û hevalan yên derbasî û çawronîkirinê ez 3 mehan ji mal derneketim. Wê yekê, pir bala min kişand.

Min hêvîyên te pirsî lê te qala tu hêvîyan nekir ku ez bêjim çend ji wanan bi cih hatin.

– Di dilê min de tu hêvîyên ewqas ciddî û tu guherînên mezin ku bi cih werin tunewûn. Ji bo wê jî, ez ê tu bersîvê jihevkirî nedime te. Lê li derketina derve, min dixwest ez jîyaneke bi xwedî malbatî damezirînim. Ji bo wê jî bi xanima min ya ku me hevdu di hundir de nas kir, min dixwest em ji pêşerojê re amadekarîyê bikin. Ji bo wê jî em bi serketin.

Gelo ew mereqa te ya ji bo fîlm û fîlmên dokumentasyon ji ku tê?

– Ku tu meriyekî polîtîkî bî, ev bi wê ve girêdayî ye. Ji bo min ew hacetek e ku tu pê derdên xwe bînî ziman. Nîvisandin jî perçekî wê ye. Lê bi rêya fîlm, xwe îfadekirin ji bo ku ew

www.arsivakurdi.org

bi dîtinî ye bi min hê baş tê. Mereqa min jî mereqeke kevn e. Salên ez li lîsê, bi fotbolê dileyîstim, bi hevalekî ve, makîneke me ya ji 8 mm fîlm dida lîstikandin hebû. Wek fîlmê Ahmet Uluçay, bi navê *"Karpuz Kabuğundan Gemiler Yapmak"* Me jî ji xwe re ji perçeyên fîlma yên bi dest me diketî fîlm çêdikirin û dida lîstikandin. Çend ceribandinên min yên tiyatroyê jî bûbûn.Li wan salên zanîngehê, di nav wê jîyana polîtîkî ya bi lez de faalîyetên hunerî çiqas paş de mabin jî, eleqeya min ya tiyatroyê û sînemayê berdewam kiriwû. Salên ez di girtîgehê de wûm, min çend lîstik nîvisandibûn. Ewana me bi hevalên girtî ve kiriwûn sahnê. Çend ceribandinên min yên weng bûbûn. Yek ji wan min ji berhema Günay Aslan ya bi navê (Yas Tutan Tarih) adepte kiriwû. Mijara xwe ji helbesta, Ehmed Arîf ya bi navê "Sî û sê Gule" girtibû. Min ew bi navê *"Adı Yasak Ülke"* nîvisand û derhênerîya wê kiriwû.

Heta niha di vî warî de çend berhemên te amede bûne?

– Du şuxulên min bi dawî bûn. "Halepçe Sonsuz Umut– Hêvî Nemir" û "Sınırda Kalan Umut." Mijara xwe ji jîyana yên ji derîyê Wanê de ketine Turkîye digirt û belgesel e.

Di berhema te ya li ser Helepçeyê de alîyên tu xwe bi serkeftî dibînî û yên ku ne bi dilê te ne, hene an na?

– Helepçe, şuxuleke hempar wû. Bi hevalekî ku dixwast li ser Helepçê pirtûkekê binîvsîne û here Helepçê re, bi Necmattin Salaz re min sohbet dikir. Bi ser pêşnîyara ku "Em vê şuxulê bikin fîlmekî jî." me dest pê kir. Pêvajoya vî fîlmî giştik min bi rê ve nebirin. Dema roportajên ji bo fîlm pêk hatin, ez li wira tune wûm. Hacetên ku me bi dest xist û dîtin, ne wiqasî ku min dixwest. Dixwest em cara duduyan herin wira. Li wira kêmasîyên ku min tesbît kir, me hinek rakirin. Çûyîna me ya duduyan, rastî salvegerîna komkujiyê hatibû. Me li wê salvegerê ji Helepçeyîyan re temaşekirineke taybetî pêk anî. Min dixwest, meriyên ber wê, me pê ra roportaj kirîve hê nêzîk bin û kişandina fîlm bi detay bi cih bînin. Lê wê yekê bi qasî ku min dixwest têrî min nekir. Ji her alîyekî dinê de rojnemevan, TV hatibûn. Wana jî dixwest wê komkujiyê, bi detay biêvîsin û weşandina wan pêk bînin. Ji bo wê jî merivên min dixwast ez pê re roportaja çêkim meşqûl wûn. Ji vekirina derîyên arşîva yên berê venekirî û ji hacetên dest me de bêtir tu rêyên me yên din tunewûn. Me jî bi hacet û wan îmkanên dest me de bi şikla hê baş fîlm kişand û bi dawî anî.

www.arsivakurdi.org

Projeyên te yên pêşerojê hene û çi ne?
– Erê, hene. Niha di dest min de çar projeyên kişandina wan berdewam e, hene.
1– Bi ermenî yên Tirkîyê ve girêdayî ye.
2– Belgeselek e ku mijara wê pêvajoya ji 12ê îlonê hetanî huro diajo.
3– Belgeseleke din jî li ser ew kesên ku ji zên ve bi qusûr in.

Ew ji ku hate bîra te?
– Bi ser hevalên min yên li wan dibistanan mamoste, ez dawetê dibistanê kirim û hevalekî navendeke weng rêva dibe tecrube û bîranînên xwe bi min re parve kir û wê mijarê bala min kişand û min biryara xwe da.
4– Projeya herdlerîzina Wanê
Yek jî di serê min de du projeyên hene, hê butçe û projeyên wan ne amade ne u mijara wan hepsên Mamak û Diyarbekrê ne.

Pêşnîyar an jî tewsîyên te li xort û keçên ji kurdên Anatolîyê bikî hene?
– Ez ê ji wana re vêya bêjim. Kokên xwe, çanda xwe, qedr û qîmeta kultura xwe ji bîr nekin. Ji wan erf edet û çandê, alîyên rind vebijêrin û biparêzin. Alîyên paşverû û ne hemdem bavêjin. Ji bo em bi bingeheke azad û wekhevî di malbata dinê de cih bigirin, xwe bişidînin. Bi lêpirsînî, ne bi reçetên ku berê amedekirî, ma lêkolîner bin. Dixwazim bi xwendin, bi lêkolin û bi berpirsîyarîya xwe û zana bi rê herin. Bi gelên din ve, bi empatî di nav têkilîyê de bin. Ji bîr nekin ku ya ji wana re maf bizanin, ji gelên din re jî maf e. Dixwazim ji bo mafên xwe yên kesayetî, demoqratîk û netewî jî di nav xebat û berxwedanê de bin. Bi kurtasî kesî nepelixînin, xwe jî nedin pelixandin.


Tu wek însanekî ji Anatolîyê kovara Bîrnebûnê çing dibînî?
– Ji bo fikirê jî, ji bo karê kirî jî belkî ji ya pêşî de me difikîrî zêdetir rolekî girîng lîstiye û bi kar anîye. Ji bo kurdên Anatolîyê, ji çand–kultur û parastina zimên, bi zimanê dayîkê xwandin û nîvisandinê re bûye pêşkeşvan û roleke mezin lîstîye. Daxwaza min ew e ku va tesîra wê qat bi qat zêde biwe û bajo. Bi taybetî jî cîvanan himbêz bike û bi çerçeweke wisa jîyana xwe berdewam bike.

Mala te awa, bo te wexta xwe da me û kurtejîyana xwe bi me re parve kir.
– Ez jî ji bo keda te dayî, ji Bîrnebûnê re jî, ji bo ku bûye wesîte sipas dikim. Ji jîyana min ku xwendevanan mînakin girtibin, ez ê kêfxwaş bibim.

www.arsivakurdi.org

Dadgeha pêşewa Qazî Mihemmed

Nivîskar: ***Ebdurrehman Qasimlo***
Kurmanciya wê: ***Ziya Avci***



Ev nivîs bi minasebeta bîranîna 66-saliya îdamkirina Qazî Mihemmed di malpera Netkurdê de çap bûbû. Ji ber girîngiya nivîsê û maneya xwe ya dîrokî em jî evê nivîsê ji bo xwendevanên xwe di Bîrnebûnê de çap dikin.

Red.

Ji bo munasebeta bibîranîna 66 saliya îdamkirina Pêşewa Qazî Mihemmed

Di meha befranbara sala 1325 (kanûna pêşî 1946)an de, dadgeha Pêşewa Qazî û Huseyîn Seyfî Qazî dest pê kir. Di roja 9ê befranbarê (30yê kanûna pêşî 1946ê z.) de Sedrî Qazî jî ji Tehranê anîn Mahabadê û zîndan kirin û bi vî awayî hersê Qaziyan bi hev re mehkeme kirin. Dadgeh nehênî bû, nedihîştin kesek bizane ka gelo di dadgehê de çi diqewime.

Li milekî din jî dema ku Pêşewa Qazî û hevalên wî daxwaz kirin ku ji xwe re parêzer (avukat) bigrin, ev daxwaza wan ji aliyê dadgehê ve hat redkirin. Serokê dadgehê Serheng Fîrûzî li hemberî tevgera demokratîk a gelê kurd û şexsê Pîşewa gelek bi kerb û kîn bû û beriyê jî di zemanê Komara Kurdistanê de wekî nûnerê leşkerê Îranê hatibû Mahabadê. Bi ser van tevan de dadgeh nehênî bû û nehiştin Pîşewa û hevalên wî ji xwe re parêzer jî bigrin û bi zorî parêzerekî bi wan dan qebûlkirin. Roja 19yê meha befranbarê (9ê kanûna paşî 1947ê z.) Pêşewa xweparastineke (difa'eke) bi rêk û pêkî û azayane kir, ku 14 seetan domand, dadgeha resmî ya leşkerî ya Şah ew red kir. Ew sened û belgeyên ku di dest de hene û heta yên bi destê dijminê gel jî hatine nivîsandin, bi başî nîşan didin

www.arsivakurdi.org

ku Pêşewa bi ruhiyetê mesûliyeteke mezin ku dîrok kiribû ser milên wî, qasî ku di daxilê quweta wî de bû û ew şert û mercên dadgeha resmî ya leşkerî rê didan, daxwazên gelê kurd û armanca Partiya Demokrat a Kurdistanê û her wiha gavavêtinên Komara Kurdistanê bi mêrxwasî parastin.

Ji roja yekê ya şikestina Komara Kurdistanê ve, ji Pîşewa Qazî re du mesele gelek baş zelal bûbûn:

Yek; wî baş dizanî ku mirin li hêviya wî ye, tecrûbeyên bi salan ên xebata gelê kurd jê re dabû xuyakirin ku li hemberî dijminekî zordar û fêlbaz e, ku bi xwîna wî û yên wekî wî tînî ye, ji ber vê jî ji roja girtina xwe ya yekê heta roja biryara dadgehê ya resmî, têkoşî ku xwe berpirsiyarê bûyeran û hemî gavavêtinên Komara Kurdistanê bihesibîne. Qazî dixwest bi vî awayî hem li ser rê û armancên partiyê û gel wefadar bimîne û hem jî çiqas jê bê barkirina tawanên ser hevalên xwe kêm bike û belko bikare cezayê wan hinek siviktir bike. Dudu; Pêşewa Qazî gelek baş dizanî ku yê tê dadgeh kirin ne şexsê Qazî Mihemmed e, belko tevgera demokratîk a gelê Kurdistanê ye. Armanc û daxwazên gelê kurd ê zorlêkirî ye ku dadgeha eskerî ew tawanbar dihesibîne. Her ji ber vê jî wekî rêberekî serbilind û zana li hemberî xwinmijiya rejîma Şah bi qehremanî sekinî û Komara Kurdistanê parast.

Dijminên gel gelek hewil dan ku Qazî bînin ser wê noqteyê ku bêje ez ji kirinên xwe poşman im û daxwaza lêborînê bike û li hemberî wan bikeve ser çokan. Lê Pêşewa Qazî, dadgeha eskerî û karbidestên artêşa şahînşahiyê kir ser çokan û ew naçar kirin ku li hemberî mezintî û azatiya wî serî bitewînin. Heta roja îdamkirina xwe jî, ku ne temaşevan li wir hebûn, ne parêzer û ne jî ew dadgeha wî mehkûm kiribû dadgeh bû, li ser nizmayetiyeke ku li gelê kurd hat kirin, Pêşewa Qazî kursiyek girtibû û li serê dozgerê (sawciyê) eskerî xistibû. Ne tenê kevneperestên Îranê, belko axayên wan ên biyanî, emperyalîzma Emerîkayê û Ingilîz jî hê hêvîdar bûn ku Qazî Mihemmed bixapînin û karekî wisan pey bidin kirin ku ew pişta xwe bide wan kar û kirinên xwe, zaʻaf nîşan bide û teslîmê wan be. Lê Qazî Mihemmed vê carê jî neket bin bar û pêşniyarên nûnerê amerîkî ku deh roj beriya îdama wî çûbû balê, Qazî pêşniyarên wî anîbûn red kiribûn. Ew, ne bi derketina li dijî tehdîdên wan tirsiya û ne jî soz, peyman û belêniyên wan tiştekî hesêb kirin. Pêşewa Qazî ji wê sonda ku di 24ê rêbendana sala 1324 (13yê sibata sala 1946ê z.)an

www.arsivakurdi.org

de xwaribû re wefadar ma, şehîd bû, ew di dilê gelê kurd de serbilind dijî.

Roja 3yê rêbendana 1325 (23yê kanûna paşî 1946ê z.)an, yanî sal û rojek piştî ku serokkomar bê helbijartin, Pêşewa Qazî û hevalên wî mehkûmê îdamê kirin. Lê bicihanîna hukmê îdamê paşde avêtin, 66 roj bi ser re derbas bû û heta roja 10ê xakelêweya 1326 (31ê adara 1947ê z.)an ew hukum li Mahabadê hat pêkanîn.

Yek; Pêşewa Qazî şexsiyetekî siyasî yê ku jê gelek dihat heskirin bû û nedikarîn wisan bi hêsanî û bêyî ku hinekî nefikirin, wî îdam bikin. Ji ber vê jî seet 3yê beyana sibê, piştî ku Meydana Çarçirayê ji her milekî ve bikin bin ablokayê û li serbanan heres bên danîn, Qazî û hevalên wî hatin îdamkirin. Dema ku xelk ji xew rabû, êdî Pêşewa û hevalên wî şehîd bûbûn. Bi vî awayî ne tenê dadgeha Pêşewa û hevalên wî bi dizî hatibû kirin, belko îdamkirina wan jî bi dizî hat meşandin. Sebebek wê ya din jî ew bû ku wê çaxê hê berxwedanên li Kurdistanê xelas nebûbûn û bi taybetî berxwedana Barzaniyan ne tenê ku berdewam bû, belko tengî û eziyeteke mezin jî dabû leşkerê Şah. Rejîma kevneperest a Tehranê ditirsiya ku îdama Pêşewa Qazî û hevalên wî bibe sebebê nerizayiyeke zêde ya gelê Kurdistanê û heta mumkûne bibe sebebê berxwedaneke bi hêz a xelkê Kurdistana Îranê.

Li ser îdama Qaziyan, di nava karbidestên Tehranê de jî dubendî hebû. Hinek ji berpirsiyarên siyasî yên dewletê terefdarê îdamkirina Qazî û hevalên wî nebûn. Lê kesên eskerî hewil didan gelek zû ew hukmê îdamê bê bi cih kirin. Çunkî ew di wê baweriyê de bûn ku Pêşewa Qazî hem di dema Komara Kurdistanê de li dijî leşkerê Şah sekiniye û heta bi çavekî sivik li eskeran nêriye, hem jî di dema dadgehê de bi tu awayî amade nebûye bikeve bin barê daxwazên eskerî û bi mêranî li hemberî wan rawestiyaye û li hemberî wan dijîtî kiriye. Leşkerê Şah ev helwest li hemberî xwe bê hurmetî dihesibandin û daxwaza serê Pêşewa Qazî dikirin.

Di netîceyê de, piştî îsrara amerikiyan, ku gelek kêfa wan dihat îsbat bikin, çi kesî li dijî siyaseta Amerîkayê hereket bike, ji wê jî zêdetir, bi Yekîtiya Sovyetê re dostiyê bike, di ferhenga wan de cezayê wan her kuştin e û li gor helwêsta şexsî ya Heme Riza Şah, ku ji her kesî zêdetir îsrar dikir Qazî Mihemmed bê îdam kirin, biryara dawiyê da, hukmê îdamê îmza kir û ji sertîb Humayûn ê ku wê çaxê ji bo rêvebiriya şerê leşkerê Îranê li dijî Barzaniyan li

www.arsivakurdi.org

Urmiyê bû, şand. Emrê pêkanîna hukmê îdamê, roja 9ê xakelêweyê (30ê adarê) gihîşt destê Humayûn û wî jî bi telsizê gîhand Mahabadê. Li ser vî emrî, roja 10ê xakelêweya 1326 (31yê adara 1947)an, bi wî awayî ku me behs kir, Pêşewa Qazî Mihemmed, birayê wî Ebû'l-Qasîmê Sedrî Qazî û kurmamê wî Mihemmed Huseynê Seyfî Qazî li Meydana Çarçirayê hatin îdamkirin. Di eynî meydanê de, ku roja 2yê rêbendana 1324 (22yê kanûna paşî 1946ê z.)an de Komara Kurdistanê hatibû îlankirin û Qazî Mihemmed serokkomar hatibû helbijartin.

Şexsiyeta Qazî Mihemmed pêwîstê lêkolîneke zêdetir e. Ew şexsiyetê mezin, di dîroka gelê kurd de xwediyê derece û meqamekî taybetî û bilind e, ku pêwîst e xortên nûgihiştî wî binasin û her çend temenê wî gelek dirêj jî nebû, lê jê ders bistînin(34). Pêşewa Qazî Mihemmed, rewşenbirekî dahî bû, ku wê çaxê emsalê wî di nava neteweyê kurd de gelek kêm dihat dîtin. Qazî Mihemmed di şaristaniyet û zanistiya nû û her wiha di derheqê rewş û bûyerên cîhanê de şarezayekî temam bû. Zimanê tirkî, farisî, ingilîzî, erebî, fransizî û rûsî dizanî, di zanistiya ayînî û civakî de xwediyê ciyekî bilind bû. Ji bo ku rewşenbirekî derece bilind bû, di nava xelkekî sade û mixabin beşa piraniya wê nexwenda de dijiya, wekî gulekî bû li sehrayek hêşîn bûbû, lê cardin gelek nêzîkî wan bû, gelek baş bi derd, eziyet, hêvî û daxwazên wan gihîştibû. Di anîna meydanê û derxistina ew derd, eziyet, hêvî û daxwazan de ji hemî kesî serkevtîtir bû. Bêyî sebeb nebû, ji aliyê gelê Kurdistanê ve ewqas jê dihat hezkirin ku cara yekê di dîroka xwe de xelkê bi xwe naznavê "Pêşewa" pey ve kirîbû. Pêşewa Qazî, hemî zanistiyê û têgihiştina xwe ji bo xizmeta gel amade kiribû. Ji her kesî baştir dizanî ku welatê wî çiqas paşdemayî ye, gelê wî yê delal çiqas bê xwedî ye û hevwelatiyên wî di çi rewşeke ne li bar û di nava çi perîşanî, feqîrî, eziyet û îşkenceyê de dijî.

Hemî ev taybetmendiyên han bûbûn sebeb ku Qazî Mihemmed roleke gelek girîng di tevgera demokratîk a salên 1324-1325 (1945-1946)an de bileyîze. Rêz û hurmeteke taybetî ji şexsiyeta wî re hebû(35). Gotinên Qazî xwediyên îtîbareke taybetî bûn û nêrînên wî rast û durûst dihatin zanîn.

Pêşewa Qazî, gelek têdikoşa ku di nava gelê kurd de yekîtiyek çêke. Ew rastiya dîrokî li ber çavê wî bû, ku yek ji wan sebebên şikestina hemî serhildanên beriyê yên gelê


www.arsivakurdi.org

kurd bûn, ku ew jî nebûna yekîtî û yekdengiya hundurî bû. Pêşewa Qazî, gelek hewil da ku dijîtiya di navbera eşîretan de rake, her çend ev karekî hêsan nebû, lê ew heta dereceyek bi ser ket.

Li bajarê Mahabadê yekîtiyeke bê emsal di navbera hemî rûniştiyan de pêk hatibû, heta piştî şikestina tevgerê û hatina leşkerê kevneperest ê Îranê jî tu kesekî kêfxweşî û şadiyekî nîşan neda, kes amade nebû destê xwe dirêjî rêvebirên Komara Kurdistanê bike(36).

Piştî şehîdbûna Qazî Mihemmed gelek rexne lê hatine kirin. Ev rexneyên han ne yek û dudu ne, lê ji hemiyan girîngtir ew e ku ji ber çi li hemberî êrîşa kevneperest a Îranê nerawestaye û berxwedan nekiriye? Nezera hinek kesan ew e ku eger li hemberî wan rawestabûya û berxwedan kiribûya, rewş bi tevayî dihat guhertin.

Rast e, nedibû Pêşewa Qazî wisan bi hêsanî xwe teslîmê dijmin bike, ew jî dijminekî ku wî gelek baş dizanî çiqas fêlbaz û dirinde ye. Lê Qazî Mihemmed vî karî ji bo parastina ruhê xwe nekir, ji ber ku ew mesûliyeta wî ya mezin ku li hemberî gelê kurd hebû, Pêşewa ji bo vê kirinê han da. Rastî ew e, piştî tehlîleke kûr û zêde ku beriyê jî hat behiskirin, Pêşewa Qazî tu feyde di berxwedanê de nedidît. Nedixwest xwîna xelkê kurd ê bê berevanî bi destê leşkerê dagîrker birije. Eger em bêjin teslîmbûna Qazî Mihemmed şaş bû, lê ev şaşî beriya hemî tiştî bi



www.rizgarikurdi.org

nirxê jiyana wî temam bû. Ew kesên ku Pêşewa Qazî nas dikirin û agahê wan ji boriya jiyana wî hebû, dizanîn ku Pêşewa bi dilxwazî xwe tûşî wê şaşiyê kir. Însandostiya wî ewqas zêde bû, ji bo ku gelek kesên din bikarin bijîn, dixwest ew bê kuştin û şehîd be.

Çend roj piştî îdama Pêşewa Qazî û hevalên wî, çar kes ji baştirîn zabitên hêza pêşmergeyên Komara Kurdistanê, 'Ebdullayê Rewşen Fikrî, Hamidê Mazûcî, Mihemmedê Nazimî û Mihemmed Resûlê Nexedeyan, li Mahabadê û her wiha 'Elî Begê Şîrzad ê fermanderê hêza Bûkan li bajarê Bûkan hatin îdamkirin. Du hefte beriya îdama Pêşewa û hevalên wî, di 26ê meha reşeme ya sala 1325 (16yê adara 1947ê z.)an de, 11 kes ji serokeşîretên Feyzullabegî û Gewrikî yên Seqizê, ku bi çalakane beşdariya Komara Kurdistanê kiribûn, li bajarê Seqizê hatin îdamkirin. Ew kesên hatin îdamkirin jî ev bûn: Ehmedxanê Faruqî (Salar), Ewlexanê Metîn, Hemexanê Danişwer, 'Elîxanê Fatih, Hesenxanê Kanîniyaz, Hemed Begê Babaxan Beg, Ehmedxanê Secî'î (Şenge), Şêx Emîn Eshedê Kesnezanî, Axa Sadiqê Eshedê Yazîbulaxî, 'Elî Axayê Ciwanmerd Temûte û Resûl Axayê Mehmûdê Mîredî.

Bîr û raya fermanderên leşkerê Şah, wê çaxê ew bû ku dibê hinek ji serokeşîretan jî bên îdamkirin, ji bo ku ew bên tirsandin û teslîmê siyaseta dewleta merkezî bin. Bi rastî jî hewce ye bê gotin, fermanderê arteşê baştirîn kes ji bo îdamê helbijartin. Çunkî serokeşîretên Feyzullabegî û Gewrikî yên Seqizê, wefadartirîn piştivanê Komara Kurdistanê bûn.

Bi vî awayî rejîma kevneperest a Tehranê, baştirîn karbidestên Komara Kurdistanê şehîd kirin. Ji wan 28 kesên li Mahabadê hatin mehkemekirin, beşeke ji wan bi cezayê zîndana hetahetayî, beşeke din bi cezayê 15 salan û beşeke din jî ji 2 sal heta 15 salan hatin hukumkirin. Gelek kesên ji karbidestên Komara Kurdistanê, piştî gihîştina arteş li Mahabadê baz dan û piraniya wan çûn Iraqê û Suriyê.

Leşkerê Îranê, li Mahabadê dest avêt ji ortêrakirina hemî şûnewarên Komara Kurdistanê. Bi awayekî eşkere kitêbên kurdî li meydana bajêr şewitandin, belgeyên dema Komara Kurdistanê yan yên beriya wê, yan xelkê ew ji tirsan dişewitandin an jî piştre leşkerê Şah ew îmha dikirin. Temamê hewl û kirinên dewleta merkezî ew bû ku tu şûnewarekî ji Komara Kurdistanê nemîne.

www.arsivakurdi.org

Heyran û qurban

Xezal çav ji te dizîn e
Mîna te sox tenê Zîn e
Zîn heyrana te ye, xezal qurbana te be

Li ba te ne qala Leyl e
Ne jî qala Mecnûn dibe
Leyla heyrana te ye, Mecnûn qurbanê te be

Şekir tu yî, Şêrin tehl e
Cîwan tu yî, Ferhad kal e
Şêrin heyrana te ye, Ferhad qurbanê te be

Te da gulê, reng xwîna xwe
Wek te dengxweş bes bilbil e
Gul heyrana te ye, bilbil qurbanê te be

Êş û jan birîna dil e
Serxweş e Gurdo, hem dîl e
Dil heyranê te ye, dîl qurbanê te be

Gurdo

www.arsivakurdi.org

bezirganên
welatên dûr û welatên xerîb
em ji mêlaîkan dûr
nêzîkî mêvanên bêdewat kirin
bifikire
rûpelên dîrokê xwe
û yên dunê
yek bi yek wergerîne
hefizê xwe teze û zengîn bike
terîx rêyêke bi kevir e
lingên însên ê zu xwîn bibin
cesaret û tirs feyda nake
yên ku li hemberî te ne
hesabên xwe yî kirine
di hundirî hêsêbên wanan da dîn û îman tune
ew herdem hazir in
dora
roja zarokên bêparastin
hatibû qilabanê
qilaban newaleke kur û qutsî ye
navî çavên çîyayên herdem sipî ye
kûlîyên berfê
xwe li ser pêlên bayî bakur
wek kenî zarokan sîwar kiribûn
û xwe hedî û hedî xwiş dikirin
qilabane xwe bi hîvronîyê xemilandibû
û mîna zîv dibiriqî
û koça wanan di newalê qilabanê da
wek çemî cenetê diherikî
ji nişkeve li ezman xuya kirin
însanan lê nerîn
rêzanê kerwanê got
na qertelên xewger in

www.arsivakurdi.org

na ewrên ku rîyên xwe şaşkirî ne
na jî pêlên okyanûsê ku serserî ne
ew berhemên
mejoyê rojava yî hov
û dilî rojhilatî barbar in

qilaban
di tîlîyê min da gustîrkeke reş e
ancax germîya volkanan bişewitîne.

Seyfi Doğan

sarı rengin
alabildiğine hakim olduğu
sonbaharin güzel bir gününde
okulun bahçesinde
sarı yaprakları dalga dalga dökülen
zerdali ağacının gölgesinde
arkadaşlarla konuşurken
aniden yanıbaşımızda bitiveren
öğretmen söyledi
kürtçe konuştuğum için
hem suç işlemiş
hem de gunaha girmiştim
o gün
ve daha sonrası
benim için
taşınması zor günler oldu

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

Çîyayên asê

Va çîyana, çîyayên asê
Kesek jê ra neket bahsê
Aliyeki vî, çîyayê Agirî
Ezmana dikelisîne
Malbatkarî kiriye, ji Nûh ra
Aliyeki vî, çîyayê Nemrûdê
Ji ser eniya vî
Nişangeha komekana
Cîhê bav û kalê kurdan e
Aliyek vî, çîyayê Şengalê
Têda tajon, hespê xwe
Egitê kurdan e
Bîrnekirin,
Dilê Dewrêşê Evdî
Û hespê vî, hevdane
Dibên, ew pîrê me aşiqan e
Va çîyana, bi dil xatir in
Hemêza wan da

Dimeşin kerîyê xezala
Xweşik têye, dengê bilbila
Distirên, li ser derd û dila

www.arsivakurdi.org

Yoz dicire, ji newala
Şivan billûra xwe lêdixe
Bi du necala
Dengê xwe tere erd û ezmana
Va çîyana, çîyayên asê
Kesek jê ra, neket bahsê
Ne nas kir, ji Timûrê lingxwar
Ne serê xwe daxist
Ji ber Îskenderê mezin
Ne ji kela xwe ket ser tirkê xwînxwar
Hatin,
Ferman danîn
Kon vegirtin
Û cîh negirtin
Pisika xwe çêl kirin
Berbahî baranê ketin
Û bûn çivrok
Kurd û bi çîyayên asê
Govenda xwe daynan
Bi hezar salan.

Îbrahim Korkamz
Kopenhag 05 05 2012

www.arsivakurdi.org

Şopên dema xatirxwaztinekê -II-

Nuh Ateş

Merivên mala Reşoyê Kulik siwê zû rawûn. Dizanîn ku mermalî û cîran ê sewa xêrkirina birêketina Simo werin mîvandariyê. Bêdengî û xemgîniyê dagirtiwû ser heyamê navmalê. Evarê fersend nedîtiwûn, xwang û brayan bi dengekî huskutî temeyên xwe li Simo kirin. Reşoyê Kulik, di pey nimêjê va, berî berve pencereya li rohelatê kir û bi piltepiltkî due xwendin. Paşê berê xwe berve Simo kir û bi dengekî bi şewat yê ku pêlên meqamê dilêşiyê jê belav dibûn û kela hundirê meriva dikire girî, got:

– De here lawê min, meleyka ra hêlê te kevin û di tengiyê da Xizir xwe bi gihînê te. Here li çareya serî xwe mês ke, li van deran êdî îstiqbal tune ye! Bi xêr herî û sax û silemet bigihêjî şûna xwe. Hay ji xwe hewe, bi merivekê çê we, xîret ke ku tu li ser pîyên xwe dawestî û mihtace tu kesî newî. De, ji te ra oxir be! Dûv ra, serî kire ber xwe, tê bigota, ew î bi hundirê xwe da digirîye.

Bi ser gotinên bavê va, Simo giriyê xwe zept nekir, bû xulexula hêstirên wî. Bi lez rawû ser xwe, bi destmalê çavên xwe zîwa kirin û rahîşte bawilê xwe, derket derva. Li pêş malê, mermalî, nas û cîran kom bûwûn. Wan li pey hev ji Simo xatir xwaztin û çûyîna wî bi gotinên hingê yên li rewacê xêr kirin. Gotinên wan yên oxirkirinê, „bi xêr herî û bi xêr werî“, „çûyina xêrê we”, “Xwedê ji qeza û beleyan biparêze!”, „Xwedê îşe te rast wûne!“, “tu tahliya newînî!”, “Xwedê bi fedîkirin nede!“ li peş malê, li hewa belav diwûn. Simo xatirê xwe ji mermaliyan xwazt, çû destê mezinan û çavên piçûkan. Dayik, xwang û bûka mezin hetanî ser rê vi hêla wî ketin. Li ser rêyê, wan deriya otobosê çavbikira. Gava ku Simo bawil di dest da ji pêş malê berve rê çend gav ranan, di pey va, li gorê nistiya hingê, sewa rêwîtiyeke bixêr xwangê zerikek av rijandin. Neh û deh gavan dûrî malê, çend çilkên xwîna qurbanê ya ku duh sewa xêra çûyina wî serjêkiribûn bi ber çavên Simo ketin. Wan bi şiliya ava baranê reng avêtiwûn, şêli bûwûn. Ew dera şûna serjêkirina qurbanê wû. Qurbanên ku lî eydên dînî ji bo

www.arsivakurdi.org

xêra Xwedê, li dewet, şîn û şahiyan tên serjêkirin. Sewa ku xwîn li wan deran belav newe, korteke biçûk dikolan û qurban li ber wê serjê dikirin. Xwîna wê berdidan korte û paşê bi xwêliyê ser diniximandin. Kî dizane xwîna çend qurbana li vir heriqî û bi herdê da çû xwarê. Nefesa çend heywana hate birrîn û çend heywana li hember destê bikêr yê li ser qirika wan bi çavên mat û belkirî nig çirpandin.

Li vê derê, Simo di emrê xwe da careke tenê qurban serjêkiribû û di pey va, hema bîrve çûwû. Ji hîngê vir da, wî dest pê serjêkirina heywana nekir. Berê, ku wî xwîn didît, heş li serî diçûn û hundir li hev diket. Paşê, pêda pêda ew tozikê hûbû dîtina xwînê, heşên wî pê nediçûn. Ew ji ber tirsa bîrveçûyînê û serjênekirina qurbanê bi berxwe diket. Edet wû, carna çavên qurbanê bi destan digirtin yan bi paçekî girê didan. Li gorê girbûn û hêzbûnê qurbanê, merivekî yan du merivan nigên qurbanê digirtin. Carina nigên qurbanê sewa ku zêde li ber xwe nede û serjêkirina wê hêsan be girê didan. Kêra ku pê qurban bê serjêkirin bi kevirê kênarê xaniyê malê disutin. Şopa kêrstunê li ser kevir, çend gavan ji malê dûr va jî xuya dikir. Bikêrstunê kevir ji kênarê da qewer û sîsik bûbû. Serjêkirina qurbanê karê meran wû û ya bi destê jinan ne edet wû.

Simo li diwana giregiran bûbû şahîdê mineqeşe û mitaleyên li ser qurban serjêkirinê û çavgirtina qurbanê. Çend mitaleyan ji hev cihê li ser vê mijarê hebûn. Digotin, Hezret Brahîm, wexta ku xwaztiye lawê xwe, Ismaîl sewa xatirê Xwedê bike qurban, çavê wî girê dane. Lê Xwedê nehîştiye ku Brahîm lawê xwe bike qurban. Lowma meleykakê bi emra Xwedê jê ra pezek ji bo qurbankirinê aniye û ji hîngê vir da, qurban serjêkirin li eydê qurbanê bûye tore. Li gorê mitaleyeke xwemaliyên Beraniyê, sewa ku qurban biserjêkirina xwe nehêse, pê nêşê û li ber xwe nede, çavên wê tên girêdan. Li gorê mitelayeke din ya ku ji hin aliyan da dijberê vê bû, qurban bi girêdana çavan pê dihêse ku ew ê li ber serjêkirinê ye. Sewa ku qurban haziriya rêwîtiya xwe ya berve dünyaya rast bike û xatirê xwe bixwaze û nizanibe ku kî wê serjê dike û nifira li yê ku wê serjêdike neke, çavên wê tên girêdan. Simo jî tevê, komeke piçûk, pirtir jî xortên xwenda yên mêl berve çepitiyê miteleyeke nû diavetîn pêş û digotin, qurban serjêkirin toreyekê xwînrijandinî û jîyanherimandinî ye. Li gorê wan, ew toreya pir kevn e û di ber dînên yekxwedêyî da jî

www.arsivakurdi.org

hewûye. Berê ji bo xatirê Xwedêyan meriv jî dihatin qurbankirin, lê niha sewa xatirê Xwedê tenê heywanan dikin qurban. Bi ya wan heywanan jî gune ye, jiyaneke bê zulim û xwînrijandin heqê wan e jî. Ne durist e û adil e ku meriv ji kêsikî heywanan xêra bike û sewa xêrkirinê jîyana wan biherimîne, bi dawî bîne.

Xortên Beraniyê yên xwenda di bin bandora rûdan û guhêrtinên li Tirkîyê û li dünyayê li serbestî û guhêrtiye digerîn. Carcaran bi awayekî tûj li tore û tabuyên dînî, rabûn û rûniştinên li gorê tevgera axetî û êşîrtiyê, li hebûna xizanî û qelawiyê û durûtiyên axeler û mezinan didan. Di warê kinc, cil û bergan da jî meyila wan berve guherînê wû. Dayika Simo, Almas li ber wî digerî ku ew havînê li nav gund bi îşligê pîqol negere. Digot, „eyb e!“ Lê Simo guh nedida wê. Piraniya xelkê gund, bi fikir û gotinên Xortan geh dikeniyan û geh hêrs dibûn û bi dengekî bilind destpê azar û şîretan dikirin. Henan ji bo xortên han wer digot:

– Wax wax wax, çi heyf e! Xwediyên wan ew şandin mekteb û medreseyan sewa ku bixwînîn û bibin merivên çê, lê ka, ew ê li dijî emrên Xwedê derdikevine, elemaşkera ji rê derketine! Kominîstiyê dipesinîne, dîn û imanê, ar û nemusê nas nakine!

Heyamî ewrî bû. Baraneke hûrik dipişikand. Ji mîvanan yên ku ji bo oxirkirina Simo hatibûn, henan digotin, „çûyîna xêrê ye, aha mêz kin, nêmeta Xwedê, baran dibare!“ Li gundê Beraniyê barîna baranê mîna nîşana xêr û bereketê dihate hesibandin. Baran omdiya cotkar û rençberan bû. Li vê derê Anatoliyayê baran pir kêm, li bahar û peyîzê dibarî. Lewma gotina „carekê bi xêr bibariya“, li peyîz û baharê ji zarê gundiyan kêm nediwû. Havînê herd zîwa, ji tîna da qeliştbiqeliştdibû. Di çaxa zaroktiya Simo da, salên ku baran pir kêm yan qet nedibarî mêrên gund, giregir li pêşiyê heldikiştin ser girê li perî gund yê ku jê ra Girê Baranê dihata gotin û li wir dueye baranê dixwandin. Ew li wir rêz dibûn, beriyê xwe berve jur dikirin û li ber Xwedê digerîyan ku ew baranê bibarîne. Sewa vê qurban serjê dikirin. Li pêy ayîniya baranê, di broşên mezin da goşt û zad dikelandin û li xelkê ku li wir kom bûwû, li xizan û zarokan belav dikirin. Meresîma ayîniya dueya baranê ji xort û zarokan ra diwû şênahî. Ew pê şa dibûn, dilîstin, yarenî dikirin û gotina Hopoyê şorxwaş ya li ser dueya baranê dubare dikirin û pê dikeniyan. Li gore qalkirinê, rojekê gundî derketine dueya baranê. Xortek li nav gund

www.arsivakurdi.org

berva Girê Baranê bi lez dimeşiyaye û bi rê da raste Hopo hatiye. Di navbera wan da dan û standineke weng derbas bûye:

– Xorte keleş çir bûye, xêr e şer e, tu weng bi lez kûva diherî?!

– Ez diherim Girê Baranê!

– Ma li Girê Baranê çi qewimîyê?

– Li wir, huro dueya baranê were xwandin, pehhh, te hay jê neye, xalê Hopo!? Were em tevehev herin!

– Na, ez nayem, tu here, dueya baranê bi çî min ketiye!

– Estexfirle, çima dueya baranê bi te neketiye?

–Ma zeviyên min hene, ne bihostek herdî min tune!? Xwedêyê ku gavek herd nekiriyê nesîwê min, dueya min jî qewûl nake?

Hopo vê herd bû û di deriyê xelkê da dişuxilî.

Sewa barandina baranê baweriyên din ên kevn û ji çaxên entîk da mayî di zaroktî û xortaniya Simo da dihatin bikaranîn. Yek ji wan şewitandina maran bû. Digotin, ku mar hate şewitandin, barana bibare. Simo jî carekê teve meresîma şevitandina marekî ji aliyê komek xortên cahîl va bûbû. Meresîmeke bi xof bû. Mêr ji ber êşa şewitandinê dikire qîjêqîj û xwe vir da û wê da radikişand û bi herdê va dida ku bifilite. Di hen efsaneyên kurdan û ermeniyan ên li ser serhatiya Hz. Nuh û keştiya wî qala rola mêraniya mêr û şewitandina wî bi destê Hz. Nuh tê kirin. Kevnetoreyeke din jî Buka Baranê bû. Xort û keçikan paç û pûç, parçeyên cil û coran li darekî yan jî şijingekê dipêçan û mîna bukekê dixemlandin. Navê wê Bûka Baranê bû. Keç û xortan, Bûka Baranê di desta da malbimal, li nav gund digeriyan û li deriyê malan dixistin, sewa xatirê baranbarînê xêr û xelat dixwaztin. Niha, li Beraniyê toreyên bi vî tonî û xwendina dueya baranê û serjêkirina qurbanê sewa vê hatibûn cîhîştin. Niha li wir, dueya bixêrçûyina Ewropayê tê xwendin û sewa biserketiya seferên koçberiya berve Ewropayê qurban tên serjêkirin.

Simo di rêwîtiya xwe ya Almanyayê da ne bi tenê bû. Homerê Arto jî bi wî ra biçûya. Ew du sala berê çûwû Almanyayê û bi mehekê hatiwû serdana malbata xwe. Tetîla xwe teva bûwû û vedigerî. Mermalîyên wî jî sewa oxirkirina wî hatiwûn ser rê. Pêçekê bi şûn da, otobos hat û li qirara wan dawestî. Wexta ku Simo û Homer lê sîwar bûn, nalenal û îskeîska jinan deng veda. Hêstir ji çavên wan da dixulxulîn û dihatin xarê. Dengê şîna wan li hewa belav dibû û li dengê xişinî û şîrpeniya baranê ya ku kalkal dibarî diqelifî.

www.arsivakurdi.org

Mîna ku bibêjî, ezman jî digirî. Simo di camê pencereya otobosê ya ku bi xwêlî û xûbarê şêlîbûyî ra li derva, li mermaliyên xwê yên ku çend gavan dûrî rê dawesti bûn û hêstir dibarandin mêz kir. Dilopên baranê yên hûrik ji derva da, bi ser camê ra lut dibûn û bi rê da qilêra camê lixwe dipêçan û berjêr dixûşîn, dihatin xarê. Di navbera xulîna dilopên hurbaranê û hêstirên çavên dê û dotên wî yên ku li kênarê rê stûxwar dawestîbûn da xemahengiyek hewû. Hundirê Simo dikelî, keser li ser kesere dikişand. Homer bi ber dilê wî da diçû û qala tiştê bê eleqa û bi ken dikir ku pê mêla wî belav bike, bikişîne ser tiştên din.

Otobos bi guregur û patepat bi rê ket û di pey xwe va dû û bîhna mazotê belav dikir. Simo bi bihn û bexa mazotê nexwaş diwû. Her ku ew bi otobos yan kamyonên servekirî diçû bajêr, bi rê da serî diêşî, hundir lihev diket û vedirişî. Bixwedeketî û bêdeng diwû. Wî bi nihêrînen melûl di camê otobosê ra li derva mêz dikir. Li ser pîyê rê yê rastê mexelê pêzê malê bavê bi ber çavên wî ket. Şûna mêxel mîna xelqeke fereh û reperût xuya dikir. Tenê li vir û wê, ta bi ta gîyayên cûr bi cûr dirûzt. Gîyayên ku pêz tohimê wî ji ger û gerandina xwe ya li çîya û baniyan di nav heriya xwe da kaş dikir û dianî li mexel belav dikir û bi rix û mîza xwe gir û gur dikir. Li wir, havînan pezê bi şîr ji yê stewr dihata vedan. Yê stewr li wir mexel dihat, yê bi şîr sewa bêrî û dangkirinê dikişiya ber malê. Yê stewr ji ber germa havînê sewa ku li cihekî hûnik mexel bê, herd bi pêkolkirinê vedida. Lowma şûnwarê mexelê pêz mina xelkeyeke reperût xuya dikir, mîna ku ji ezmên da metoridek li wir ketiwû û ew dera birîndar kiriwû. Di zaroktî û xortaniya xwe da, gava çercî dihata gund, Simo bi hevalan va diçûn mêxel heriya bin zikê pêz dirûçikandin û dibirin li ba çerçî, pê mûj, hêjir û benî kendirê distandin. Bi xwarina van tiştên xweştam kêf û şahî li rûyên wan peyda diwû.

Çend gavan dûrî mêxel kevirên xwêdanîyê hatiwûn danan. Heft kevirên gir, çar û pênc bihosta bilind û ji jur da rûpan. Gava ku wextê xwe dihat, xwê li ser wan dikirin û pê pez xwêdidan û di dûv ra dibirin Deşta Hêşin, ser avê. Kevirên xwêdaniyê ji xûrê ra jî bi kêr wûn. Pêz xwe bi wan dixûrand. Ew dera şûn û warê beremakkirin û beranberdanê jî wû. Van toreyên pezxwedîkirinê diwûn wesîleya şênî û şahiyan.

Peyîzê pez ji çolê dihata vê derê. Şivanan mîh û beran bi arengê sur û motifên pirçeşîd dixemilandin. Bi rengê sur pişt û milê wan boyax

www.ersivakurdi.org

dikirin. Rengê sur beran har dikirin. Digotin, bi arengê sur ew sor dibin, hewesa wan ya viketinê gur dibe. Beran demekê ji pezê mihê vedidan û di gom yan hewşan da hetanî vê rojê digirtin û bi yêmên xwaş xwedîdikirin. Paşê ew berdidan ser keriyê mîhan. Meresîma beranberdanê rûdaneke balkêş û rewayî dîtinê wû. Nihevsê, wextê ku beranên têrtijî û bi arengê xemilandî, bi teriyên pan û qilot ji gom yan hewşê berdidan û ew berve şûna ku keriyê mîhan li hatibû komkirin dikişiyan. Serbilindî û heybeta ku beran pê bi rê diçûn, dûvgerandin, dihevheldan û şerê navbara wan a li ser helkiştina ser mîhan şayanî seyrê bû. Roja beranberdanê, sewa xêr bereketa wê, malbatên bi sermiyan û keriyên pêz li dêrî qurban serjê dikirin û dawet çêdikirin. Li pêş malên wan diwû şênî û şahî. Lê niha, mexel û xwêdanî xewle wûn, bê kes mawûn. Ev cih û warê xêr û bereketê yê ku bi keriyên pêz, bi xebata xwedî û şivanên wan, tore û şahiyên pezxwedîkirinê şên û gurleh dibû, niha mîna ku weran bûwû. Kevirên xwêdaniyê yên ku bialastina pêz a bi salan ji jur da sîsik bûwûn û bermayiyên toza xwê ya ku di kêrtikên wan da mayî li ber tavên rojê tebrusîn, êdî sîsikî û brûsîna xwe wenda kiriwûn.

Otobos ji mêxel û xwêdaniyê derbas bû. Otobosekî kevn, xişexal wû, tê bigota, ew î ji dewra Hz. Nuh da maye. Ji ber kêrt û kortên rêya bêasfalt û çexmûra şiliya baranê giran diçû. Ew di ser çend newal û bewrarên piçûk ra derbas bû. Li ser pîyê rê yê raste deşteke kort, pan û fereh hewû. Jê ra digotin Deşta Hêşin. Havîn û peyîzan jî, wextê ku her der direwsî û zer dibû, wê hêşin dikir. Li dora wê, di sê deran da kanîsdank hebûn. Ji ava wan di du derên deştê yên kort da du golên piçûk peyda bûwûn. Zemanekî ew dera şûna pezavdanê û bêrîyê bû. Havînan li wir xerman rêdixistin. Simo di pencerê ra bîstekê çav li Deşta Hêşin gerandin. Resimên demên zaroktî û xortaniyê hatin ber çavan. Mîna hemsalên xwe, wî biharê li vê deştê berx diçêrandin. Havînan di golên wê da ajnî dikir û teve îş û karên xerman û bêderan diwû. Li wir, peyîzan bi heval û hemsaliyên xwe va geh li hesp û kerên serbest berdayî sîwar diwûn û ew didan bezandin, pêşbazî li dar dixistin. Geh jî bergîr û ker berdidan ser mihîn û mankerên ku dihatin delew û bi zevq û sefa li merasîma vêketina wan ya bi ar û alav, şer û şehwet sêr dikirin, pê mest dibûn. Ji helnana xermana bi şûn da, keçik û bukên gund bi kincên xwe yên pirreng li Deşta Hêşîn, sewa dagirtina ardûyê malê,

www.arsivakurdi.org

rixa naxirê berehev dikirin û ji bo ku ziwa bibe jê sergî çêdikirin. Huro, meriv êdî raste van dîmen û rûdanan naye. Deşta Hêşîn reng û rûyên xwe guhêrîwû, ji hêşinî û şêniya xwe pir tişt wenda kiriwû û her ku diçû xizan û xewle diwû. Di kanîsdankê wê da, êdî av kêm diza, kwîrik diheriqî.

Mîna ku li wê derê edet bû, baran zû terikîwû û ewr belav bûwûn. Otobos bi rêya xilûxar da dikişiya û di nav deşt û ban, kaş û bewrar, gir û newal, neqew û beroj, hêrg (şûvan) û anizan (xozan) ra derbas dibû û kalkal berve qezayê rê qat dikir. Li van deran, Simo di xortanîyê xwe da bi hemsaliyên xwe va biharê pîvank, xilf, gizêr û kereng radikirin. Rengê peyizê yê zer bi tonên xwe yên cihê dagirtibû ser herdê van deran, tê bigote der û deşt gîştik ê bi zerikê ketine. Li hêla zerikê tonbiton, der bi der qehwereng jî, rengê din yê bi tîn li vê deverê, vi ber çavan diket. Ew pirtir rengê herdê ajotî ye.

Otobos ji nav herd û ezmanê gundê Beraniyê viderketiwû û nêzikî rêya esfaltkirî ya Anqereyê biwû. Simo şûn û warê ku jîyana zaroktî û xortaniya wî lê derbasbûyî li paş xwe cîhdihîşt. Jîyaneke ku ji paşê da, jê va mîna efsaneyî û çêrokî xuya bike.

paşî heye
19.03.2012

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di ***Bîrnebûn***ê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

www.arsivakurdi.org

Destûr

Seyfi Doğan

Ezî li balkonî malê xwe runiştîbûm û min xurinîya xwe dixwar. Mala rojê ava be! Ê rîya min ronî û bedenê min germ dike.

Dema ku însan li cîh û warên xwe yê hundirî merîyan fireh dibe, xwebawerîyêke bilind ê însên rehat dike.

Xwebawerî enerjîya mêjo ye.

Min berê xwe, berve çîyayê ku li bakurê malê mina kiribû û çîyayê rubar nerm û aramî temaşa dikir. Çîyayî rap û rut e. Ji xeyrî zinaran, tu derên ku zindîyek xwe ji germê romê rutik biparêze tune. Du an jî sê darên şîlanan xuya dikirin, wanan jî suyê xwe ketibûn ser sîng.

Ji nişke ve papapûkek li hundirê herimê danîşt. Ez mat bûm. Hêcaneke xurt û germ xwe li min pêça. Ji zû ve ye ku min ew cinsî çuçikê nedîtibû.

Papapûk, çuçikeke koçbere. Li payîza dereng, difire Afrîkayê û li devê biharê tê herêmê me. Perikên wê yê kîla reş û sipî û sîng û stuyê wê yî zer kontrast û harmonîyeke renga ye. Kumikî serî wê wek tacekê, dunê dixemilîne.

Papabûk, bizdonak û wek qayixekê ku li ser pêlên avê dihêje, li ser axê digerîya û bi nikulî xwe yî dirêj û tuj ji bin erdê, kurm dertêxistin. Demeke kin, li nav herimê cex bû bi şunda, bi lez, pêl û pêl berve çîyan firî.

Ki hîng ezî têwêda bûm, min dît ku ji hemberî min da, merîyek tê. Kalekî bastonê wî di dest wî da giran û giran berve derî mala min tê.

Kal, wexte ku nêzîkî derî herimê bû dawestî û:

– Destûr heye.

– Ser saran û ser çavan.

Min derîyê malê xwe ji kalê re vekir.

– Berxwedar be kekî mino!..

– Bi xêr hatî !

Rojê diqilijînê.

Mîvên xwe da ser kursîyê hemberî min. Însanekî sipî û şuştî û rî û porsipî bû. Kincên wî pak, lê kevn bûn. Merasên wî, rojên zor û zehmet aşîkar dikrin. Şopên xemgînîyên kur, li sûretê wî xuya dikirin. Min xal û xatirê Kalê jê pirsî û dewatê ser sifrê kir. Rabûn û runiştiyê Kalê ê aram û birûmet bûn.

Min ji Kalê pirsî.

– Ji kuda têyî û kuda rêwî yî?!

– Heyran! Qurban!

Ezî dînim. Ezî dînim.

www.arsivakurdi.org

Ezî bê welat bê cîh û war im.

Ve çend sal in ezî derwîş û derbider im.

Alavên sor bi pergela bedena wanan keve!

Qiresê cêrmî şil canî wanan biguvişe.

Ezî ji welatê çîyan, welatên zozanan û ji welatê çêmên cenetê me.

Û nûha jî derbider di du parîyek nanê xwe yî rojane digerime.

Kalê, ji çayê xwe qultek daqultand û gotina xwe berdewam kir.

– Ji kekî xwe re bibêjim. Min li welatê xwe, li welatê kal û pîrên xwe...weylo, weylo... mêşên hingîv xwadî dikirin. Zozan bi zozan, çîya bi çîya û newal bi newal, min mêşên xwe digerandin, li nav gul, gulistan, heşinîyê û keskîyê da kêf li cîh îdarê xwe dikir. Di ser dev re nedirijî lê îdarê me dibû.

– Ezî li nav merlixê xwe bûm.

– Ezî li ser axê xwe bûm.

– Bax û baxçê min hebûn!

– Em pelçiqandin!

– Em şeqe bi şeqe kirin!

– Me nav û dengên hevdu ji bîr kirin!

– Kekî mino! Ne barekî hêsa ye! Ji wan salan bi şunda ji axê xwe werî derxistin!

– Werî qawitandin!

– Hewcîyê parîyêk nan bibî!

– Axê malê bavî xwe terk bikî!

– Li rojên pîrozî, gor û goristanên kal û pîrên xwe zîyaret nekî!

Kalê gotina xwe berdewam kir.

– Min bi piranî mêşên xwe li newalên çîyan bi cîh dikirin. Her bilindîyeka çîyan, li gor xwe, gul û gîyan û hêşinîyê xwe heye. Li jor darên şîlana, li dawîyê çîyê beybûn hebûn. Min ji herduya jî çay çêdikir. Cîhên ku fêz hebûn, bi piranî yûzerlik û zarmasî dibûn. Li cîhên bi qûm, catiri dirust û bêhneke xwe yê teze û însan zindî dike yê heye.

Li dawiyê çîyan gelek kereng dibûn. Min ji keranga, caciqê bi sîr çêdikir. Min kereng baş sîpî dikirin û dikeland û ji dûra mastî bi sîr li ser dikir.

Meşan, ji çeşît û çeşît gulan şerbet û toz kom dikirn û barî xwe di qevan da têwirandin. Bi hezaran mêş, bi hevdu re difirîn û li derî kodan têwirîn.

Ez sibê zu radibûm. Bêhna gulan û dengên çuçikan derdorên zozanê dixemilandin. Gulabukan pelikên xwe yên ku avî girtî, didan ber tîrêjên rojê û pelik wek zer dibiriqîn. Dengî kewan hundirî merîya germ dikir.

Dengî zengilên kerîyan, jîyan radikir ser lingan.

Biharê, kalekalê berx û mîhan dilî merîya zîz dikir. Kalekalê berx û mîhan wek şîne hesretê û şayîya hevdîtinê bû. Mîh ji kezebê da

www.arsivakurdi.org

dinalîn. Mîh û berxan hevdu bi deng nas dikrin.

Qertalên ku perikên xwe mîna ewran û hêlînên xwe li navî çavî çîyan, xwe li ser pêlên bayî sibê siwar dikirin ji cîwcîwên xwe re li nêçiran digerîn.

Tebietê herdem min nişkegavî (Surpriz) dike. Li ser eynê axê çeşît û çeşît meyvê û heşinî.

Min pir caran, wextê ku hîng zozan ji kerîyên pêz re qedexe nekiribûn, bi şivanan ku pêzî xwe li zonanan bi xwedî dikirin re, taştê xwe dixwar. Me mîhên bi şîr didutin û savar dikire nav, şîr û hingiv li ser dikir.

Erê, erê, kekî mino. Min nimêjî xwe kir bi şunda, min agirekî xwe î ji êzingan ava dikir û çaydanî xwe dida ser. Kal agir kir, ji nişkeve hate bîra min. Wextê ku ezî li welat bûm, me havînê kixî fêzan reş dikir û zivistanê xwe li ber germ dikir. Agirî kix, sowe ji teneke wek rojê sor û zer dikir. Dema ku kix dibû kozî, min bi destîvê tevdida û alevê zowê, hundirî odê dikeland. Wextê ku kix di hundirî sowê da dibû kozî û gog bi gog dibû. Min nanî sêlê li ser sowê hişik dikir û rûnî mîhên sipî dikire nav û penêr li ser dikir. Way li minê... çi xulîyê bi serê xwe kim.

Min çaydanî xwe ji ava zelal, ji ava mîna petîyên agir heşin, ji ava pak tiji dikir. Ava çem, ava berfê çîyan ku dihelî bû. Ava çêm sar wek kêreke tuj bû. Ava sar merîyî qult bi qult vexwe ku tamê jê heyne. Ava çeman ê dewatkar e.

Însên dixwest, xwe li ser pêlên avê dirêj ke û derkeve rêwîtiyeke bi dilî xwe û dirêj. Carcarna dema ku hewa germ dibû, min xwe li kevîyê çêm dirêj dikir û diketim nav xem û xeyalan.

Wextê ku min hesretê xwe zep nedikir, min ji kodan hingîv dertêxist û berî xwe dida qezê. Nasekî min hebû. Min hingîv difirote wî. Min bi wan peran ji malbatê re tişt dikirîn. Ji bav û apê xwe re titûna qaçax ê wek zêr, ji keçan re fîstan û ji bûk û jinan re kutanên sipî distandin. Min ji zarokan re cil û şîranî dikirî. Keça min ê selta biçûk, pir ji leblebîyên ser bi şêkir hez dikir. Min ew çend sal in ku nedîtîye. Li ku ye! Çi dike?

Keça min e wek dilopek ava zelal û çavhêşîn û porreş.

Delala bavî xwe bû!

Ronîya çavên min bû!

Şîrîna malbatê bû!

Kezaba min dişewite.

Kalê zarxweş, demakê bêdeng ma û kelgirî bû. Min mîvanê xwe bi tenê li cî hîşt û ketime hundirê mitfaxê û çayê Kalê teze kir. Wextê ku ez vegerîyam ku Kalî li cîyan temaşe dike û omîzê xwe yên daketine ser sîng.

– Ji kekê xwe re bibejim. Wextê ku roj hildihat min dua dixwandin.

www.arsivakurdi.org

Rojên ku roj hilnedihat, gul û gulîstan diçilmisîn û herder tarî, mêşan mûriz dikirine xwe û bi dudilî difirîn. Min xurînîyê xwe xwar bi şunda, ez li nav kodên mêşa digerîm û min kontrol dikir. Mêşên devdevê rojhilatê ê hêdî û hêdî qor bi qor ji hundirî kodan derkevin û berî xwe bidin, cîhên gul û gulîstanan. Mêşên mê nektarîn, toza gulan û avê kom dikin. Bes, makmêş ê dol bigire û hêkan bike. Mêşên nêr ê xizmetî hundirî kodê û xizmetî makmêşê bikin.

Meşên nêr, li payîza dereng, dema ku edî tu kar û barî wanan nemîne ê ji alîyê mêşên mihê da werin kuştin an jî perikên wanan jêkin û bavêjin derve.

Salên dawîyê jîyan li zozanan gelek zor û bi zehmet bû! Tama berê nemabû. Jîyana zozana yê azad û pak li me herimandin.

Berê, berîvanan û bertîyan zozan şên dikirin. Gulîyên keçan û bûkan li pişta wanan wek yek çemên behîştê diherikîn. Simbêlên bertiyanê reş, xuh lê diket. Kincên wanan reng bi reng bûn.

Ew hêvîya jîyanê bûn.

Tijî hêz û enerjî bûn.

Herdê ku însan lê nebûyî, tame xwe yê nabe.

Ezî wisa dizanime.

Bi tene bûn, jîyana şêytên e.

Dûnê bi însanan şîrîn e.

Min bi şev, hewnîyê xwe xwe, bi hêstirkan û hêstirkên ku tirêjîn tînan. Berê zozan şên bûn. Em şênîyên zozanê, heme heme herşev di bin konekî da digehîştin hevdu û me henek û yarênî dikirin û stran distiran. Herkesekî li gor yetenegê xwe û bi zanyariyên xwe teve şênayê dibû.

Henek kilamên agîtan an jî destanên dilan digotin. Hesê Gulê Hembirê şivaneki li ser xwe bû. Çoyî xwe î giran bû. Kesî xwe qola û qola nedida ser. Hesê, behsê agîtên ku derdiketin serî çîyan dikir.

Ji destana Mamê Alan gelek dihat hezkirin. Hemê Hecî Oxcî ji heq destana eşqê Memê û Zînê derdiket.

Şevên ku ezî bi serî xwe bûm, kurapê min ji min re, ji Elmanyayê teyîbek hunîbû.

Min guhdarîya stranên Mehmed Arîf Cizirî, Karapetê Xaço, Kawis axa, Meyrem xanê û dengbêjên din ên delal û bi rûmet dikir.

Dengî Mihemmed, dengê çîyan û zozana ye. Dengê qîrînîyê hesretê ye. Musîka Arîf a cîhên fireh û siwarê ba û bahoza ye. Zinarên çîya **dihelin** û ji navî çavên çîyan da heta dawîya çîyan lut dibûn.

Wextê ku min guh dida ser kilamên Cizirî hundirî min dikelî. Min dixwest, pazdim! Bimeşim û serî hildim bi çîyan ve hilkişim.

Ezî ji zirafên û dengî bilûrê ji gelek

www.arsivakurdi.org

hez dikim. Wexta ku ezî li welat bûm, Hesê Elê, zilamê mêrxas, şivanê hêja, şivanê kerîyan mezman, bi bilûrê, hekatê dilî Xecê û Sîyabendî lêtexist. Bawer bike, çîya û banî dadewêstin. Zîrek û jêhatî bû. Zirafî Zembîlfiroş jî gelek baş lêtêxist.

Çend rojan bervê, ezî li gundî Omera bûm. Dîsa wek îro li kar û barekî xwe digerîm û li malakê bûm mîvan.

Xwedîyê malê, guh dida ser bilûrê. Min jê navê bilûrvan pirsî. Got: Miçê Elî Pitê ye, telebê Hesî Cûcê ye. Miçê gelek xweş li bilûrê têxist. Zirafî Şêx Saît ji heq derdiket. Zirafî Şêx Saît zehmet e. Herkes nikane wî hewayê xemgîn, serhilda û zîz derxe.

Ve bi salan e ku ezî li nav kurdên Anatoliyê me. Min tu xirabî ji wan nedît. Mala wan ava be.

– Ji kekê xwe re bibêjim, rojekê, li berbangê, ez bi dengên wesitan hişyar bûm. Min hîn doralîyên xwe dinerî ku namluyek li ber pozî min peyda bû.

– Derkeve derva!

– Ez derketim derve. Ne bê bibêje, ne jî ez qalê bikim. Bi sedan esker û sîlah.

Seresker bi min re got: ez, carake din naxwazime te li vir bibînim. Min û seresker maneya wê gotinê baş fehm dikir.

Ji wê wextê vir da, ez carak din neçûm zozanan. Ê ve çend demsal rabirtin. Min mêşên xwe bi perekî erzan firotin û ji ax û welatê xwe derketim û nuha jî der bi der li kar digerim.

Destûr: Wexta ku min ji Kalê, ew peyve bihîst, ez gelek şa bûm û min bi xwe û xwe got: ew gotina, peyveke pir kevn e û bi hezaran sal di ser re derbas bûne, lê îro, li Xelika, bi hezaran kilometre ji cîhên ku ew gotina hatîye peydakirin dur, hîsên min hîşyar dike! Dilê min germ dike! Min bi tarixa min û mîtolojîya min re tîne ba hev û qeytanê mîrasî min qêm dike.

Dînê Zerduşt, ji destpêka Mazdaîzmê da heta dawiyê împaratorlixa Sasanîyan (224–651) dînê kurda î fermî bû.

Destûr nîşana miftîyê dînê Zerduştî te an jî seyxûlîlsalamê dinê Zerduşt e.

Destûr: li gor qaidê rê û rêzên dînê Zerduşt fetva didan. Maneya destûrê hatîye guherandin. Destûr îro, wek meqemekî dînê Zerduştî ku zanyar û waqifê tesewûfa dînê Zerduşt nayê bikaranîn. Wek îzîn û musadê tê bikaranîn.

Destûr li gor tesewûfa dînê Zerduşt girtina ruhsatê ye.

Destîv: Bi tirkî: maşa.

www.arsivakurdi.org

Temenê têkçûyî

bi cama evîna dilê şikestok
bêçaretiya xwe li zendê salên poşman
dinivisînim
şopa tirsa demsalên hovane
di kefa destê xwe de
vedişêrim
pêşeroja min
di herika rûbarên giyan de
xeniqî
ji gewriya nûçeyên rojane
jehra xwînê
dipale
li nav nivîna şevên bêxewiyê
xewnereşkên xopan
xwe li stûyê min
dipêçin
hesret û bêrîkirinên min
bi keserên dûmanê cixarê
hatine meyandin
serê min
ji nav belaya demên rûreş
qet nafilite
carnan
mîna hêrsa pêlan dîn û har dibim
carnan
mîna beytika newêrek can li min
dilerize
şûşeya eşqa dilê serxweş
di toza heyamên gemarî de
qelişî
min
li nav dûmanê xeyalên pûç
daxwazên dergûşa nava xwe
taloq kirin
li birçîbûna çaxên genî
bîranînên xwe yên wêran
dixwim
li nav pêta kul û kederên bêhempa
dişewitim
ji piyangoya temenê têkçûyî
tofana janên dirinde
derdikeve
şadiya rûyê min
di albûma wêneyên xemgîn de
zerikîn
bi tasa destê dilberê
şerbetê didim gêrikên di bin lingan de
hatinî perçiqandin
ez bûm qurbanê
eşqa îlahî ya nependî
û her tim di ber cankêşiyê de me
êdî ez
di coşa xumexuma şîpa laşê xwe de
astengiyan nasnakim
ji aloziya dîroka tarûmar
hêviyên şad ava dikim
derhênerê şanoya vê helbestê ez im
leyîstikvanê li ser dîkê ez im
temaşevanê xerîb jî ez im
li ber xemkêşiya rondikên çavan
leyîstik qediya
û perdeya dilê xeşîm
hate girtin

Xizan Şilan
2010-07-02 / Stockholm

www.arsivakurdi.org

Şêxbizingel kî ye, ji ku kêçax raçe hatiyîne Heymene

Xamgelî Bane

Kurdi navi Anadolu firê nîyaye nasandin. Hete îgave jî le bani eye qe ne hatiyi vistandin. Rave le seri kurdi navi Anadolu firê tişt nîyaye zanistandin.

Şêxbizingel je kun?
Welatê zerastîyan ku ve?
Je ku, kêçax, raçe hatiyine heymene?
Şêxbizingel ve kan zan qise rikerin?

Le seri kurdi Anadolu firê tişti nivisî îjnîye. Îme jî ve tişgeli destiman û ve qalgeli qewretirgelimano ke çiqes zanim çerx vî ratan da qali kurdi şêxbizingel vikerim.

Kurdi şêxbizingel eşîretî gewra, verci kurgdeli dik yê ke seri sifta hatiye navi Anadolu ewanan. Şêxbizingel vilavi hebar şun vîyin. Lay firîyîyan ale heymena. Le heymene dîyeli şêxbizingel le hendiyek, nêzikiyek, hamsêyekin. Welatê zerastîyîyan kurdistanê vaşure. Le kurdistanê vaşur le navberi sulemanîye û kerkûk, xaneqîn, teq teq, bazeyan, çemçemali şêxbizin hestin. Şêxbizingel le kurdistanê vaşur je rû ceng û nizeyeli navi xûyan le 1450 bari îran kirmanşah kirdiyin. Şah îsmail ke dewletê safevî ye xiste desti xwê dîyaw, ra ke şîîtîye vilavo vikerî şungeli sunî ve barkirdandinda û ey şungele şîîyel kird dê. Şêxbizingel sunî vî, Şah îsmaîl jî turkmeni şîî vî. Şêxbizingel İngirîn ke lure nêkerin vervi şungele ke sunnîyel firîye, vervi, El-ezîz- palu, Amed-Çermîk, Haqqarî, Muş-Varto, erzirim barkirdin. Xakeli kurdgel de navberi îran û osmanlîye mavî. Xakeli kurdgel ra ow çaxane re bini zefti îdrîsî bîdlîsî vî. Kurdgel de xakeli xûyan le seri xûyan vîn. Şah îsmaîl rake şîîtîye heyidik vilavo vikerî, diranandiye ban xakeli kurdgel. Yavuz sultan jî nerixestiye ke je ban xakeli kurdgelo şah îsmaîl vervi xakeli xwê vay. Îdrîsi bidlîs û yavuz leyek rikerin û pirs dirin veyek ke viçine ban şah îsmaîl.Rave le 1514 ne cengê çaldıran hatiye ve kirdin. Yavuz ey cenge le şah îsmail kirdiye û xakeli desti xwê heyîdik vişo kirdiye. Le ey cenge kurdgel le pişti yavuz Vista vî. Je ey cenge ve dîyaw yavuz derîyeli Ana-

www.alsivakurd.org



Jinên Şêxbizinî ji Heymaneyê

dolu ra şêxbizingel-kurgel vokird. Yavuz ra şêxbizingel secerey riderxî û rirîkê vîyan ke xûyan ke le ku Anadolu xwestin lûre oyirin û vinîşin. Kurdeli şêxbizinî ve teraka diliy rivîyayin. Ra ow çaxane şêxbizingel tiştî vê nerikirdin û neriçinandin. Ve xake vestîyaw nevîyin. Ve pes, bizin û huştir xwûyan ve xavind dikirdiyin.Je dîya ke yavuz xweztiye ke vervi navi Anadolu van, şêxbizingel jî, rake, ra tereka çuli veveri nu vînin, ve qor qori şên û gewre, le serîyan qazî huseyîn serxistiyinde barkirdini vervi xwereva.

Je dîya cengê çaldiran û seceray yavuz kurdgeli şêxbizin yên lenavi Anadolu le girdi heymene hatine vînandin.

Ra ow çaxane heymene?

Le 1402 navberi yildirim beyazît û Tîmur-Moğol, cengê engurî vîye. Ey cenge tîmur dielgirîkê û heymene rikefî re zefti tîmûr. Tîmur heta 1521e heymene re desti xwê riyirî. 1521 heymene serzenî yavuz sultan tevi xakeli osmanlîyel dikerîkê.Ra ow salgele le dîyeli heymene ermenîyel hevîye. Le dîya ke heymene rikefîye desti osmanlîye, ey diroke dîya çengê çaldirane, şêxbizingel je lay yavuz vervi nav heymene riyane çirandin. Ra ay gave jî dîyele ke şêxbizingel alîye gî dê ermenîn.

Le Heymene nêziki 36 dê Şêxbizin hestin. Dîye ke sifta lê oyirtiyin Gozgoz dîyar diri. Le salnamay "1894 nê vilayetê Engurî" navi Gozgoz dîyê Şêxbizin di xericî. Şêxbizingel gî je

www.arsivakurdi.org

eynî eşîretin. Qeymiyek rivin, Jeyek xeverdarvîyin. Le dîya ka gozgoz le şunay ay gavê xwê royirî, ve risi xwê barkirdine şêxbizingel le heymene riranî.

Şêxbizingelle ke hatine heymene lîrgele demî dirîj ve rêngel û pesgel şuxîlîyavin. Ke vervihar divîyave xênce zaruvel û pîrgel, yêdikel ve rêngelo je dîyel dûr diçîyan. Heta payîz le hewşîyel dimînayin. Şêxbizingel ra ke çuli leveri xas û baş vînin diçiyavine Samsun–havza û çarşamba, Amasya, Qastamonu, Sinop-boyabat, Trabzon, Karabûk, Çankiri, Kütahya, Bolu-düzce û ve hewşîyeli girdê. Jê dîyaw ke Osmanlîye îjmardandini nûfuse kird, şêxbizingele ke le deri heymene vîyîn, le ow şungele hatiyine îjmardandin û lurgele mayin û lurgele nîştiyin. Ve eyo le deri heymene şuni şêxbizingel nû, derkeftiye navça. Şêxbizingele ke ra ay gave ale nav anadolîye û ale deri heymena, je rû rêngeleke çuli leveri nû vaye vînandinestin.

Je rûje ke le welatê xûyan derkeftiyin û heta imiro, henasîyê şêxbizingel eyastin.

Şêxbizingel kesî çunin?

Şêxbizingel verci gî cengkerin, Serbilindin ve gumiran, ke tiştî kirdinde sere ravikerinê, tirs de çêvîyan nêkefî, yekitînî riyirin, dilîyan dewlemende, mêvandarin ve ocaxîni xwûyan vestîyavin. Le zanê xûyan xavindarî rikerin, jêhatiyin.

Çêv kevû û çêv sewz, pirç sor firê re navîyan hest. Dotgelîyan rinde, weki tay ruhanin, kureyelîyan jî mêrdxas û bîtirse.

B-Navberi kirmancîye û şêxbizinîye çun dîyar dirî?

Le navi anadolu kurdi kirmanc û kurdi şêxbizin hestin. Kurdi navi Anadolu gordi şêxbizingel le zane navberîyan rîyaye birandin. Şêxbizingel ve lekî-loranî qise rikerin.

Rave Şêxbizingel û kirmancgel yekitînî baş fexm nêkerî. Gewretirgeli şêxbizingel xêrîkîyan ve kirmancî rizanin, tu bo ke xurtgel weki gewretirgel nîye, ve kirmancî nêzanin. Kirmancgel jî teme ve şêxbizinî nêzanî. Rave navberi kirmancgel û şêxbizingel weki çemî du çetele, je eynî kenî riherîkî, lê berê cîyî cîyî her yekî ve layko riherîkî. Heta ke şêxbizingel ve kirmancî, kirmancgel jî ve şêxbizinî nezanî, ey çemê ve du çetelo heta heta ra viherîkî. Le şunî jî tevîyek nêvû ke enco çî.

C-Soxî zanî şêxbizingel ve kan la riçû?

Le seri şêxbizingel û zanîyan firê tişt nîyaye zanistandin. Şêxbizingel ra ke ve lekî (Loronî) qise rikerin û ve

www.arsivakurdi.org

kirmancî jî nêzanin zanîyan le şuni xwê rîjmîrî. Zani şêxbizingel le navça bîxavind maye. Zanî ke le qisa teyna hevî ew zane dewlemendo nêvu. Re bini tesîri zangeli dik ravimînî. Kurdgeli şêxbizin je welatê xûyan nêzîkî 350 sale ke dûrin. Zanîke je rey û riçalê xwê vî firê nêranî, zû ra vihelî û le rû xakel da mêk vû. Rave Şêxbizingel ra ke je xakeli xûyan dur keftin û re bini zanî din mayin zanîyan le şuni vista û heva ve bani xwe nera. Je Şêxbizingel kese ke le seri zanê xwê vivista û zane xwê dewlemendo vikirî jî qe kesî nederkefte navça. Zani Şêxbizingel raçe heta îgave nate helandin û mêk nevî? Ra ke şêxbizingel le dîyel puşiyavi der de nav xûyan vîn, zanîyan mêk nevî û heta îmiro hat. Yekî jî zani Şêxbizingel û zani tirkel jeyek firê durestin. Şêxbizingel nêziki panzdê sale ke je dîyel bari şêrgel dikerin. Le şêrgel de bini tesîri zani tirkîye mayin û ser kefte helandini zanîyan. Gordi barkirdini şêrgel riçume huşi şêxbizingel elgirte bin dest û nezanê şêxbizine kirde nav çêrxê xwê . Helandin û mêk vînê zani şêxbizingel je îmîro ve dîyaw tirsê gewray navimane. Ra îmeyel aye rimînî;le zaneman xavin viderkefîn û ra zaneman ke çe je destiman dîyay vikerîn. Ve zanê xuman qise vikerîn, ve zanê xuman vikenîn û viyîrîn.

www.arsivakurdi.org

Rola medyayê li ser zimên -1-

"fergenga me ya dîtbarî"

Îhsan Turkmen

Ji rabûna ser nigan a mirova heta niha mirovatî weke civateke sosyal jiyaye. Destpêkirine têkilî danane, tevhev jiyane, ji xwe re heval dîtine, nêçîr û şer kirine, li hev hatine, ji hev qetiyane, cîhê nû naskirine, pê re mirovên nû, destpêkên nû. Hinek ji wana bûne şah, hinek xûlam, hineka straye hinek reqisîne. Xwastine ku herkes pêbihese, ka ew çawa jiyane, çi dîtine, xwestine çi bikin. Li ser kevira, li ser posta, paşê li ser kaxiza nivîsîne. Wekî pirtûk, kovar û rojname belavkirine. Em di saya wan de dizanin di dîrokê de kêm zêde çi qewimiye. Xenophon di Anabasis de qala şerê/trajediya du birayan a berê 2500 salî li ber çemê Firatê qewimî dike. Misirî li ser papîrusan nivisîne ka bi çi lîstika Nefertîtî bûye Fîravûna yekem jin. Gatên Avesta û hesabên sala gelê Mayayî.

Destpêka sersala 21ê li seranserî dinê her roj bi sedan zimana û bi mîlyona çi li ser kaxizê û çi dîjîtal wekî pirtûk, rojname, kovar çap dibin, belav dibin û têne xwendinê. Pêwistiya agahiya her dihere zêde dibe. Di nava vê de jî par û barê herî giran jî li ser înternetê ye. Belavkirin, xwendin, lêgerîn û lêkolîna li ser înternetê bêpere û di her malê de ye, meriv dikare hema hema hemû rojnaman bixwîne, di eynî wextê de agahdar bibe. Elbet ne tenê va ye. Şoreşa înternetê herî mezin bi îcada Web2 çêbû. Di saya wê de bikarênerên înternetê pasîf, wekî nivîskar û parwekar aktîv bûn.

Googlê bi bloga destpêkir û malperê şexsî û bêpere pêşkeşî mirovan kir. Paşê Youtube gaveke din avêt û îmkana xwenîşandan û îfadekirina bi reng û deng derxist. Paşê Facebook û Twitter. Her yek ji van malperan bi sed mîlyonan endamên xwe ê aktîv hene.

Mijara vê nivîsê jî komeke ku li ser Facebookê hatî damezrandin e. Şeş meh berê hevalê min kuruktiyê Ferhat li ser Facebookê komeke bi navê „Ferhenga me ya dîtbarî“ vekir û hemû hevalên me yê gund wê demê û çendê din jî wek endam li ser

www.arsivakurdi.org

rûpelê qeyit kir. Mebesta wê komê tomarkirina peyvên meyê windabûyî yan jî yê ku pir nayîn bikaranîn bû. Wekî destpêker Ferêt, min, Cengîz, Mîran, Bile û Cem, di nava çend rojan de bi sedan peyvên ku me/min bi sala bi kar neaniye derxist holê. Lê ne tenê derxistina peyva bû ku a em motîve dikirîn. Bikaranîna peyva, mînakên li ser peyvê, henek û teq û req, serhevde û henek...

Di dawiyê de nêzikî hezar, nav, lêker, rengdêr û îdyom derketin holê. Çend hemsalê me yê komê bi vî karî qayîl nebûn, gotin: „teoooow ezî zatin vana dizanime“. Rast e ez jî dizanime, yê ji min mesttir ji min baştir û ji min pirtir dizanin. Lê kî ji me êdî wana bi kar tîne? Ji çend kesên ku yê salê wan mezin bêtir ez jî bawer nakim kû ew bên bikaranîn. Lê ew neyê wê wateyê ku, em wana ji bîr bikin. Her yek ji wana parçeyek ji kultur û nasnama me ne. Rihê ciwata me, ken û girî, hezkirin û dujminî, hatin û çûyîna me di nava wan peyvana de weşartiyê. Meriv dikare her zimanekî fêr bibe û xwe pê bîne ziman, lê tenê bi zimanekê dikarê hîs bike. Ez dibêm ew jî zimanê zikmakî ye!

Di vê nivîsê de bi piranî nav û lêkerên ku min jê hilbijartî hene. Me maneya hinek peyva a bi tirkî û hinekan jî bi kurmaciya wan a Kurdistanê nedît. Ger hûn bizanibin, kerema xwe ji me re binivîsin!

Li her gundekî me bi hezaran peyvê weng hene. Daku neyên jibîrkirin çi li ser kaxizê, çi li ser Facebookê kerema xwe hûn jî berhev bikin!

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Aliq	Meyve posası	Şîmşîr
Anadut	Anadut	Melêv
Anaqut	Angut	
Arav	Boğada	Arav
Awandin	Bastırmak	Avandın
Bambûl	Bambul	Bambul
Başheval	Etene, Döleşi	Hevalbiçûk
Başheval	Çıplak	Tazi
Bawûşk	Esneme	Bawûşk
Bejî	Vahşi	Hov

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Belax	Boy, cüsse	Bejn
Benî kendirê	Kenevir	Kinf
Berbang	Tan	Berbang
Berdêl	İstenilen kıza karşılık, kız verme	Berdêl
Berdilk	Önlük	Berdilk
Beroj	Güneşe karşı, güneş alan yer	Beroj
Berpêsîr	Süt emen çocuk	Berpêsîr
Bijaj	İştah	Bij, mijaj
Bijêrik	Kavurga	Bijêrik
Biling	Ayak dibi	Biling
Binkum (mec)	Beyîn, kafa	Mêjû
Birrek	Halı tezgahı parçası	
Bîvil	Burun deliği	Bîvil
Bîzok	İğrenen	Bîzok
Bizût	Barut	Şûre
Bulqunî	Geğirme	Hilqik
Çalxin	Handikap, beceriksiz	Bêkêr, jênehatî
Çavreşkandî	Saklambaç	Veşronek
Çelpirtik	Bağirsak	Çelpirtik
Çîksayî	Apaçık (Gökyüzü)	Çîksayî
Çîl	Sarışın	Çîl
Çilk	Katre	Çilk
Çînevîz	Dalavere	Fêlbaz
Çîp	Baldır	Çîp
Çiqilcan	Oyunda periyodik taraf değiştiren	Çiqilcan
Çoq	Diz	Çoq
Çurik	Oluk	Çirik, lûlik
Ceribandin	Deneme	Ceribandin
Cewahîr	Mücevher	Cewahir
Cewî	İkiz	Cêwî
Dagirtin	Hazırlama	Dagirtin

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Dapsandin	Bastırmak	Dewisandin, avandin
Deng	Büyük un çuvali	Deng
Deq	-Ben, benek -Aşik oynun da belirleyici aşik, baş aşik	Deq
Dernexûn	Yüzüstü	Dernexûn
Devje	Geveze	Devjenk
Dezî	İp	Dezî
Dîndar	Hazır, amade	Dîndar
Dirik	Diken	Dirik
Doxin	Uçkur	Doxin
Dijûn	Yıkanmamış	Neşuştî
Eznî	Yaslı	Dilkeştî
Fatareşk	Dalak	Patareşk
Fek	Ağız	Fek
Ferqizîn	Burkulma	Ferqizîn
Fêz	Küçük baş hayvanların gece barınağı	Fêz
Firî	Taze	Furî
Firq	Kramp	Firq
Gac	Kangal	Xelek
Gelegayî	Alacalı, bulacalı	Qerbelek
Gêj	Sersem	Gêj
Genimgunî	Buğday renkli	
Gilok	Yumak	Gilok
Gincî	Bulaşmış, yapışmıs olan	Gincî
Gog	Yuvarlak nesne	Gog
Gudik	Ayı yavrusu	Gudik
Guman	San, kuşku	Guman
Gumara	Bön, avanak	
Gurandin	Deriyi yüzme	Gurandin
Gurçilî	Zayıf, çelimsiz	Jar
Gurepik	Kabakulak hastalığı	

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Havon /Hawan	Eski tulum: Ekmeğin kurumasını önliyen ve deriden yapılan tulum	Hewan
Hecal	Değerli örtü	Hecal
Hêlan	Salıncak, çamaşır ipi	Hêlan
Henav	Bağır	Hinav
Henişk	Dirsek	Enîşk
Herir	İpek	Herîr
Hevde	Eriş	Hevde
Hêz	Güç	Hêz
Hilmakî	Eğri, iri kıyım	Hilmakî
Holik	Küçük yapı	Holik
Hênîk	Serin	Hênik
Hûnî	Nemli	Hêmî
Junî	Diz	Junî
Kanîstank	Kaynak	Avzêm
Qaqirçî	Soluk borusu	Qaqirçîk
Karsêl	Avanak	Kersele
Kefkon,	Mancınık (minyatür)	Çirik
Keldirko	Tahterevalli	Babûtanî
Kelexû	Ateşli terleme	Zipikdan
Kelmîz	İşegen/Altını ıslatan	Kelmîz
Kepir	Çorak, kireçli	Kepir
Keser	Kasavet	Keser
Keskirin, kêskirin	-Tarafların hangisinin, oyuna önce baslayacağının tayin edilmesini sağlamak için ayakla ölçülen kesme yöntemi	
Kewî, kedî	Evcil	Kedî
Kez, kêz (kurm û kêz)	Böcek	Kêz
Kinêrik	Bir çeşit nazarlık	Nusqa
Kirtik	Kıkırdak	Kirtik
Kix	Küçükbaş hayvanların dışkısı	Zibil
Kızırî	Alazlama	Kızırî

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Komişik	Köstebek tümseği	Komişik
Kong	Hayvanın toz haline gelmiş gübresi	Kong
Kosnik	Kösnük	Kosnîk
Koz	Kuzuluk	Koz
Kulek	Aksak	Kulek
Kulemek	Kalca kemiği	
Kûling	küllük	Kûling
Kurbecin	Şizofren	Şîzofren
Kurn	Kurna	Kurn
Lep	Pençe, El	Lep
Lod	Küme	Lod
Loq	Tırıs	Loq
Mekemar	Bukalemun	Margîse
Mîrîstank	Egzama	Gezne, Egzama
Mofirk	Eklem	Mofik
Nax, nex	İplik	Dezî
Nazirî	Kahyalık, tanımada ustalık	Nazirî
Nêremok	Erdişilik	Nêremo
Netkî	Oyunda ara verme	Netkî
Nigun, nûgun	Düve	Nogin
Nişkava	Aniden	Gavişkî, Nagihanî
Nîvran	Aşerme	Nebîran
Nuşkirin	İçme	Noşîn
Portal	Partel	Pertal
Parxane	Kaburga	Parxane
Paşil	- kadınlarnn eski giysilerinde (xeftan) gögüs kısmında, sağ ve sol da bulunan bir çeşit iç ceb	Paşıl
Pêt	Alev, Alaz	Pêt
Pîj	Sivri, Halı dokuma aracı	Pîj
Pirtû	Manifatura	Pirtû
Pişqul	Küçükbaş hayvan dışkısı, zıbıl	Pişqul

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Pizank	Döleşi	Pizan
Qelmûsk	Misk-u Amber	Misk
Qelûn	Sigara ağızlığı, Pipo	Qelûn
Qenare	(piranî ji bo kuçika) işsiz-güçsüz, çalışmıyan Korkak,	Xemerek
Qewer	Oyuk	Qewêr
Qurf	Ürkü, Dehşet, Panik	Qurf
Qutnî	Kutnu	Qutnî
Rav	Doğum çatlakları	Rav
Req	Takır takır, bir seferde	Req
Rext	Kargılık	Rext
Rijî	Kurum	Rijî
Rivsork	Yemek borusu	Rivsork
Rûber	Nevresim	Rûber
Rût	Çıplak	Rût
Salte	Dörtetek	Salte
Saq	Ayakkabı boğazı	Saq
Serqot	Başı açık	Serqot
Sewr	Kısır	Stewr
Silek	Obur	Xure, Hûrek
Sing	Kazık	Sing
Sîrm	Yabani sarmısak	Sîrmo
Sîrpene	Boşta gezen	Sîrpene
Şeg	-Gücü yerinde, yetenekli, - oyunda başarıln olan kimselere denir	
Şengizîn, şengijîn	Yalpalama	Beliqîn
Şerpelî	Sakar	Destpêlixî
Şevşevik	Yarasa	Şevşevik
Şilope	Kargın	Şilope
Şirik	Şerit	Şirik
Şûjî	Peynir suyu	Şujî
Şûjin	Kıyık	Şujin
Şûler	Düzen, tertip	Rêk û pêk

www.arsivakurdi.org

Kurmancî (bi devokê Xelîka –Karacadağ Konya)	**Tirkî**	**Kurmancî** (li gorê Ferhengan)
Şutelk	Kurnaz	Xasûk
Ta	İplik	Ta
Talde	Dulda	Talde
Têr	Heybe	Heqîb
Term	Ceset	Term
Terv	Kazma	Tevr
Tor	Toy	Tor
Vediz	Gizli	Vediz
Vegirtin	Tutma/Bulaşma	Vegirtin
Velîstin	Kıvranma	Velîstin
Virek	Yalancı, palavracı	Virek
Virnî	yeni dogan kuzular/yavrular icin kullanılır: Berxa virnî	
Qels	Zayif	Qels
Xem	Sorun/problem	Xem
Xenekuxik, xeneqoq	Boğmaca	Xenequtk
Xirar	Harar	Xirar
Xof	Ürperti	Xof
Xopan	Harabe	Xopan
Xulam	Köle, hizmetçi	Xulam
Xumam	Ak basma	Xumam
Xurinî	Kahvalti	Xurinî
Xwastek	Sevgili/istek	Xwastek
Zeç	Kolostrum	Kolostrûm
Zêrzand	Dil ve dil bütünü	Zêrzand
Zexelî	Sinsilik	Zexelî
Zîro	Sülük	Zîro
Zîstanî	Lohusa dönemi	Zîstanî
Zön, zwîn	Katı, sert	Zîwîn
Zo û fêr (fer)	Tek ve çift (Zo: çift, fer: tek)	
Zoxele	Bir çeşid çoban sopası	Ço

www.arsivakurdi.org

Çanakkale, Yemen, Balkan ve Rus savaşlarında şehit düşen, Orta Anadolu Aksaray - Ekecik'li Kürtlerin yaşam hikayeleri

Ömer Yüce

